

Jiyan Andiç | Francesco Pasta

DORA DIYARBEBEKIRÊ BI REZ E:

şopandina bajarbûna bi zorê
di salên 1980-90an de

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ
TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER

HAFIZA MERKEZİ



Jiyan Andiç | Francesco Pasta

DORA DIYARBÊKİRÊ BÎ REZ E:

şopandina bajarbûna bi zorê
di salên 1980-90an de

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ
TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER



HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

Ömer Avni Mahallesi İnönü Caddesi

Akar Palat No: 14 Kat: 1

Beyoğlu 34427 İstanbul / Türkiye

0212 243 32 27

info@hafiza-merkezi.org

www.hakikatadalethafiza.org

Dora Diyarbekirê Bi Rez E:

Şopandina Bajarbûna bi Zorê di Salên 1980-1990an de

Sibat 2025

Nivîskar: Jiyân Andîç û Francesco Pasta

Bergsazî û sêwirandina pirtûkê: Francesco Pasta

Wergêr: Remziye Alparslan

Ev pirtûk di çarçoveya bernameya “Bîr û Ciwantî”yê de hat amadekirin ku di navbera 01.04.2024 û 31.01.2025an de ji aliyê Hafiza Merkeziyê (Navenda Hafizyê) ve hat lidarxistin û ji naveroka wê bi tenê nivîskar berpirsyar in.

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ
TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER



**hafıza
ve
gençlik**

HAKİKAT ADALET HAFIZA ÇALISMALARI DERNEĞİ YAYINLARI

© Hakikat Adalet Hafiza Merkezi, Sibat 2025

Naverok

Destpêk | **1**

1. Cihê Rezanê: Pêvajoya avabûn û geşepêdana wê | **7**

2. Xweragirî, berwedan û pêkarîn | **35**

3. Pir-rengî li taxê | **47**

4. Weke mekaneke starbûnê, qadeke buhurînê | **55**

5. Paşguhkirin, demxekirin û valakirin | **63**

Encam | **71**

Bîbliyografiya | **74**

Spasî | **76**



Destpêk

Di vê pirtûkçeyê de em li bajarê
kurdan, Amedê, li herêmeke
wê ya bi serjimareke zêde,
li Rezanê, bajarbûna bi zorê
dişopînin û di salên 1980yî û
90î de ji ber tundiya dewletê û
koçberiya bi girseyî hejmara
niştecihên Rezanê û rûberê
wê yê erdnigarî her ku çûye
zêdefir bûye.

Lêkolînên li Rezanê

Rêza destpêkê ya kilameke navdar a bi tirkî dibêje “Li dora Diyarbekirê bi rez e”, lê belê ew rezên ku behs ji wan tê kirin roja îroyin hema hema nemane. Di salên 1980yî û 1990î de şer û pevçûnên Dewleta Tirk û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) digihêjin lûtkeya xwe û di van salan de serjimara Amedê, paytexta nefermî ya Kurdistanê Tirkîyeyê, hindik dimîne ku bibe sê-qatê serjimara berê. Piştî valakirin û rûxandina bi hezaran gundan, mirovên bê cih û war mayî ji gundan û cihên gundewar bar dikin û tên vî bajarê dîrokî û li taxên nû ava bûyî bi cih dibin ku ji koxikên bêdestûr pêk tên û di wê heyamê de derketine holê. Îro weke navendek û parçeyekî mayinde yê bajêr, Rezan wan taxên ku li jor behskirî jî dihewîne. Ji xeynî navê wê herêmê tu rêçeke wê nemaye ku nişan bide ku berî wê zêdebûna bilez a serjimarê li wê herêmê rezên tiriyan hebûne.

Bi mişextîbûna bi sedan kesan hatî ser halê xwe yê îroyin, Rezan bûye navendek ji bo pratîkên serhildêr ku dozêkê li hemberî rewabûn û meşrûbûna dewletê dikin. Di rojên xwepêşandan û şingirêdanê de xwepêşander barîkatan datînin û li kolanên teng xwe vedişêrin û di navbera wan û hêzên ewlekariyê de gelek caran şer û pevçûn rû didin. Ev navçeya bi serjimareke zêdetirî 400.000¹ weke keleha tevgera kurd tê qebûlîkirin. Lê belê ev taybetiya dîrokî û girîngiya civakî û siyasî ya Rezanê hem di akademiyê de hem di rabêja cemawerî de hem jî di dîroknivîsîna fermî de pirî caran tê paşguhîkirin. Wekî gelek deverên ku niştecihên wan bi piranî kurd in, Rezan jî yan nayê dîtin yan jî bi çavekî kevnêşopî, bi gotinên wekî “koçberiya ji gundan ber bi bajaran”, “berbelavbûna koxikên bêdestûr”, “bajarvaniya çelxwarî” hwd. tê ravekirin. Ev cure nihêrîn û nêzîkatî herêmê bi awayekî berteng bi tenê weke mînaakeke zirardayîna bajarî û plansaziyeke neserkeftî pênase dikin û taybetmendîya Rezanê ya pir-tebeqeyî bi erdê ve dikin yek û rola wê ya weke qadeke xweragirî û seferberiya siyasî ji holê radikin. Her dîsa, behsa veguherandina bajarî bingeha xwe ji van nihêrîn û nêzîkatîyan digire û ev cure projeyên “ji binî ve” jî nû avakirinê hem ji hêla dewletê ve tên piştgirîkirin hem jî Rezanê dikin armanca veguherandinê.

Her çî qasî tek û tûk bin jî, hin rabêj û vegotinên din jî hene ku li gel Rezanê baldartir in, lê belê ev jî nikarin ji çarçoveya pênasekirinê derkevin. Di van rabêj û vegotinên de tê gotin ku roleke Rezanê ya stargehê heye ji bo kesên bi zorê ji warên xwe dûrxistî û dîsa îşaret bi wê yekê tê kirin ku şopên

1. Li gorî îstatîstîkên fermî, serjimara navçeya Rezanê 406.471 e. Lê belê serjimara herêma “Rezana Kevn” ku ji 11 taxan (Fatih, Alipınar, Kaynaratepe, Körhat, Muradiye, Yeniköy, 5 Nisan, Şeyh Şamil, Yunus Emre, Mevlana Halit û Selahaddin Eyyûbî) pêk tê, 225.889 e û koçberiya zêde ya salên 1980 û 1990î ber bi van taxan çêbûbû.

zêdebûna cihûwarbûn û avasaziya gav bi gav û bi îmkânên
 pîr kêr li vir diyar in an jî tê ravekirin ka çawa ev navçe jî
 çanda gundewar a kurdî hin hêmanan dihevine û şaredarvanî
 û nasnameya bi destûr û erêkirina dewletê çawa bi rengê
 şênber xirab dike. Lê belê êşkere ye ku kêr tê zanîn ka Rezan
 di rastiya xwe de çawa derketiye meydanê.

Armanç û rêbazên lêkolînê

Avasazî û geşepêdana Rezanê jî ber sedemên cur bi cur
 girîng e. Pêvajoya cihûwarbûn û bajarbûna li Rezanê (ku
 jî ber bêtirîkirineke bi zorê, di demeke pîr kin de û bi
 fişar û zordestiyeke tund a dewletê pêk hatiye) xwedî hin
 taybetmendiyên e ku nikare bêtirî kêmasî were rohnkirin bi
 çavê kevneşopî yê avasaziya nefermî û bêdestûr. Peyketina
 avasaziya li Rezanê nîşanî me dide ka pêvajoyên li herêmên
 din ên Tirkiyeyê heyî, wekî berbelavbûna koxikên bêplan û
 bêdestûr, metabûna erdan û kombûna wan a di cihekî de bi
 têkoşîna etnîkî ya taybet a Kurdistanê û rêvebirina mêtînger a
 herêmî re çawa li nav hev ketine. Ji ber vê hindê, di vê lêkolînê
 de armanç ew e ku ronahiyê bide ser şeweyê avakirina
 bajarekî ku taybet e li erdnîgarî û dîrokeke diyarkirî û di halê
 hazir de jî kêr hatiye belgîkirin.²

Gelekî girîng e ku mirov tê bigihêje ka li cihên wekî Rezanê
 tecrubeyên hevpar ên bajarbûn, cihûwarbûn û berxwedanê
 çî ne û wan tevî bandorên wan ên civakî û siyasî yê berfireh
 qeyd bike. Wexta ku mirov xetereya veguherandina bajarî û
 hilweşandina avahiyên a bi destê hikumeta navendî dide ber
 çavan ku bi taybetî piştî van erdhejên dawî qet nebe jî hêla
 rabêjiyê de zêdetir û xurtir bûye, ev rewş êdî girîngtir e. Di
 vê lêkolînê de armanca me ew e ku em feraset û têgihîştîneke
 alternatîf pêşkêş bikin ku derdikeve derveyî çarçoveya
 pênasekirina Rezanê weke cihekî tevlihevî û hejariyê, û
 piştgiriyeke bidin nihêrîn û nêzîkatiyên cuda yê başkirina
 tevî û avasaziya bajêr li şûna “ji binî ve” jî nû çêkirinê ku
 hem jî aliyê hikumetê ve hem jî jî aliyê rêveberiyên xwecihî ve
 gelekî tê tercîhkirin tevî ku ev her du xwedî siyasî û ferasetên
 cuda ne jî.

Armanca vê lêkolînê ew e ku avasaziya Rezanê jî nû ve bifikirin
 û bala xwe bide peywenda taybet û bêhemta ya bajarbûna
 kurdan li Tirkiyeya 1980yan û 1990an û ev lêkolîna bi vê
 armançê çêkirî jî du milan de hatiye encamdan ku her du jî
 hevdu temam dikin. Serê pêşîn me li arşîvên saziyên cuda
 cuda lêkolîna arşîvî pêk anî ku Arşîva Pirtûkxaneyê Neteweyî

2. Li Tirkiyeyê di
 van bîst salên dawî
 de rahendên mekânî
 yê pîrgirêka kurd
 û bandora bajarbûnê
 ya li ser tevgera kurd
 her ku diçe zêdetir
 tîrî nîqaşîkin. Ji bo
 analîzeke berfireh a
 li ser vê babetê, bnr.
 Zeynep Gambetti
 û Joost Jongerden,
*The Kurdish Issue
 in Turkey: A Spatial
 Perspective* (New
 York: Routledge,
 2015).

li Enqereyê, Orient-Institut Istanbul, Jûra Mîmaran a Stenbolê û Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê jî di nav wan saziyan de ne û her wisa, me lêkolînên nesehayî yên li ser înternetê jî pêk anîn. Me li ser avasazî û geşepêdana Rezanê bi alîkariya weşan, nûçe, rapor û wêneyên hewayî (wêneyên peykî) dîrokçeyek derxist. Weke gaveke duyem jî, em bi niştasihên Rezanê yên niha û yên berê re li ser tecrubeyên wan ên şexsî yên têkildarî cihûwarbûn û veguherîna wir axivîn ku di salên 1980yî û 1990î de li wê herêmê jiyane û me ew weke qeydên dîroka devkî berhev kirin.

Beşên pirtûkçeyê

Ev pirtûkçe ji pênc beşan pêk tê. Di beşa pêşîn de ji bo şopandina geşepêdana dîrokî ya Rezanê me ji nûçe û nivîsarên rojnameyan û raporên fermî sûd wergirtiye. Çar beşên mayîn şahidiyên devkî, çavdêrî û çavkaniyên nerasterast di hewînî û temayên ku ji lêkolînên nesehayî û xebatên sehayî bi dest ketine di van beşan de hatine analîzkirin.

Di beşa yekem de geşepêdana Rezanê ji avabûna wê ya li salên 1960î heta roja îro bi rengekî berfireh tê qalkirin. Di vê beşê de teqwîmeke bûyerên girîng ên vê herêmê tê dayîn û ev teqwîm van bûyeran bi paşxaneyên wan ên herêmî û navneteweyî rave dike û pê re jî, nexşeyek heye, li wir jî cihên ku ji bo bîra hevpar a Rezanê girîng in, tên destnîşankirin.

Di beşa duyem de tevî paşguhkirin û mercên binesaziyeke xirab, veguherîna Rezanê weke cihekî saxfilitînê û mobîlîzasyona siyasî tê analîzkirin; li vir pêvajoyek hatiye derbaskirin ku tê de berxwedan û dijderketina zexta dewletê digihêjin hev. Kesên bi zorê bêwarkirî civakeke politîzebûyî pêk aniye ku hêmaya tevgera kurd e û piştî xwe daye torên hevgirtinê û di heman demê de jî di pêvajoyên avasazî, spekulasyona erdan û veguherîna mekanî de berev pêş çûne.

Di beşa sêyem de tevna civakî ya Rezanê tê analîzkirin. Tevna pir-tebeqeyî ya bajarî ya navçeyê şahidê avasazî û geşepêdana wê ya neplankirî ye û niştasihên wê yên cur bi cur komên cihêreng ên koçber û penaberan û çînen civakî yên cuda nîşan didin ku wan teşe daye ev pêncî salên navçeyê yên dawî. Berevajiyê nihêrîna berbelav û sereke ku Rezanê bi tenê dixê nav çarçoveya herêmeke kurdnişîn, “gettoyek” yan cihê “koxikên bêdestûr” û wê wisa pênasê dike, gelekî girîng e ku mirov pir-rengî û karakterê guherbar û çalak ê Rezanê fam bike.

Di beşa çarem de binê vê yekê tê xêzkirin ka Rezan çawa her tim bûye mekaneke buhurînê, ku meyildariya xelkê kêmdahat li ser wê yekê bûye ku li vir bi cih bibin heta ku rewşa wan a aborî dihêle ku berev deverên din bar bikin û kesên nûhatî ku rewşa wan xirabtir e, dikevin dewsa wan. Bi gotineke din, amaje bi wê yekê tê kirin ku tevî ku niştecihên Rezanê guherîne jî, rola wê ya weke stargehekê ji bo komên herî kêmdahatê Amedê berdewam bûye.


Di beşa pêncem de em li ser wê yekê disekinin ka Rezan ji berê de çawa hatiye paşguhkirin û demxekirin û ev pêvajoyên rabêjîyê bi veberhênanê (razemenî) kêmtir û bi politîkayên valakirinê yên dewletê re çawa bi nêzîkî têkildar in. Ev nihêrîn wan vîzyonên pir mezin ên ji nû ve geşepêdanê xurttir dike ku dê binyada civakî û mekanî ya Rezanê ji holê rake û bike ku beşeke mezin a niştecihên wê ji cihwarên xwe bên dûrxistin; projeyên veguherandina bajarî yên ku di halê hazir de vê derê ji xwe re dikin armanc ji minakeke ve ne.

Bi giştî, daneyên vê pirtûkçeyê, çavkaniyên weşandî û çîrokên takekesî yên niştecihên vê herêmê digihînin hev û dihêlin ku valahiyeke dîroknivîsînê ya di heqê Rezan û Amedê de were dagirtin. Ev lêkolîn her çend ku ne berfireh be jî, armanc ew e ku bibe çirûsk ji bo ku zêdetir xebat bên kirin li ser belgekirin û tomarkirina bîra hevpar a Rezanê û li ser berhevkirina dîroka wê ya paşguhkirî. Ev xebat gavek e da ku bê nasîn çika rola Rezanê çi ye di geşepêdana tevgera kurd de û di ya bajêr de. Tiştê ku li vir binî tê xêzkirin ew e ku Rezan ne di çepera Amedê de ye, ew di navenda çîroka wê de ye: Rezan ne li “derdora” Amedê ye, ew tam di navenda wê de ye. Qebûlkirina girîngiya Rezanê ferz dike ku çanda wê ya pir-tebeqeyî û kompleks baş bê famkirin û mercên wê yên jiyanî werin başkirin ku ji dêvîla tunekirina mîrasa wê ya dewlemend a civakî û maddî, rêz lê bê girtin.



1 Cihê Rezanê: Pêvajoya avabûn û geşepêdana wê

Bajarbûna bi girseyî û bi zorê ya daniştvanên kurd cihê Amedê xurttir dike weke navenda siyasî ya tevgera kurd û Rezan jî dibe binkeyeke kîlît a alîgir û piştgir ji bo partiyên kurd ên nû-seridî.



Wêneyê Amedê yê ku di sala 1952yan de ji hewayê hatiye kişandin. (2) Herêma Bajarê Nû ku (1) li derveyê bajarê kevin ê nav sûran e û her geştir dibe, teşe digire. Ji xeta rêya hesinî (rêya trenê) û îstasyonê (3) wêdetir, di nav rezan de herêma Rezanê heye ku berê qonaxên gundewar ên ji hev dûr lê hebûn û serjimara wê pir kêm bû. Mirov dikare xaçerêya Dörtölê (Çarrê) weke xalekê pênase bike ku rêyên gundan û cihên gundewar digihêjin hev (5). Li başûr Balafirgeha Leşkerî (6) û gundê berê yê nemisilmanan, Alipınar (7), hene. (Daîreya Îmar û Bajarvaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê)

Heyama destpêkê ya bajarbûnê (1940-1980)

Cara pêşîn di rojnameya Diyarbakır de di çarçoveya qeyrana avahiyan de behs ji Rezanê tê kirin. Dema salixê Rezan tê dayîn, ew weke seyrangeheke gelekî bedew tê diyarkirin ku bi “hewayaya xwe ya paqij, hêşinahîya xwe, qadên xwe yên fireh û vala û asoyên xwe yên fireh”³ dermanek e li dijî hewayaya germ ku yek ji derdên sereke yên bajêr e. Behs ew e ku koşkên bi terzeke mîmarî ya taybet û ji avahiyên din ên bajêr cuda hatî avakirin û seranser bi rezên kesk hatî xemilandin, Erenkoy û Caddebostana Stenbolê tînin bîra mirov. Heke pîrsgirêkên kehreba (ceyran), av û rê werin çareserkirin hem bajar dê taxeke nû li xwe zêde bike hem jî ev dê qeyrana peydakirina avahiyan qismen ji holê rake.

Piştî ku qeyrana avahiyan gurtir dibe, li derveyê sûran ji bo karmendan nêzikî pêncî avahî tînin avakirin. Tevî ku ev gaveke girîng e ji bo dabînkirina pêdiviyên heyî, lê dişa jî netêrker e û cihekî alternatîf ê çêkirina avahiyên nû Rezan e. Li Rezanê çi mezin çi biçûk nêzikî 300 koşkên şexsan hene.⁴ Xwediyên wan bi tenê havînan bi qasî çend mehan li van xaniyan dimînin û zivistanê ev xanî vala ne û ev jî dibe cihê gazin û nerazîbûnan.

Wê demê tê gotin ku eger rêyên di navbera îstasyonê û bajêr ber bi Rezanê ve werin dirêjkirin, dibistaneke seretayî were avakirin, ji bo hêskirina hatinûçûna nava bajêr siyareyên giştî werin terxankirin û binkeyeke polisan (qereqol) were avakirin, koşk dê zêdetir werin daxwazkirin û di van de du malbat dikarin bi cî bibin. Niştecihên vê derê, hejmara wan li derdora 2.500 kesî ye, ew jî dibêjin ku eger hewce bike, ew ê bi rêya zibareyê hewil bidin ku kêmasiyan bibirînin.⁵ Piştî çend salan şaredarî di navbera bajêr û Rezanê de seferên otobusê dide destpêkirin, lê belê ev rê hê jî dûr e ji bersivandina pêdiviyên.⁶

Di salên 60î de daxwaza dibistanê tê dubarekirin û îşaret bi pîrsgirêkên binesaziyê tê kirin.⁷ Li gorî texmînan, wan salan li Rezanê serjimar nêzikî deh hezaran e.⁸ Di vê heyamê de pîrsgirêka heriyê heye, gelek caran behsa wê tê kirin û bi salan e berdewam dike. Qada navbera Rezan û Îstasyonê dibe cihekî wisa ku wexta ku baran dibare, gemar lê kom dibe û havînan jî ziwa dibe û dibe avzêyek. Gilî û gazind tîne kirin ku ji ber bêhna pîs mixik (pêşû) xwe lê digirin, lê tu tiştêk nayê kirin ku ev avzê were ziwakirin.

Di sala 1974an de Cîgirê Parêzgarê wê demê Mezin Sarioğlu raporekî amade dike û tê de diyar dike ku li Diyarbakirê 12.000 koxikên bêdestûr hene û %33yê niştecihên bajarî li

3. “Rezan”,
Diyarbakır,
31.07.1940.


4. “Li bajarê me
qeyrana avahiyan
gihîştîye asteke
cidi”, *Diyarbakır*,
24.09.1947.

5. Pîrs û Daxwaza
Hin Hevwelatîyên
Me Ev E: ‘Gelo
Nabe ku Hawirdora
Rezanê Veguherînin
Taxekê?’,
Diyarbakır,
19.12.1947.

6. “Şaredariyê li
herêma Rezanê
seferên otobusê
dan destpêkirin”,
Diyarbakır,
30.07.1952.

7. “Gelê Rezanê
dibistanê dixwaze”,
Diyarbakır Sesi,
29.09.1960; “Halê
Rezanê”, *Yeni Yurt*,
15.02.1969.

8. “Derdê Rêyan,
demsala baranê dest
pê kir û hevvelatîyên
taxa Rezanê dişa ji
heriyê bi gazin in”,
Diyarbakır Sesi,
01.11.1961.



Wêneyê Rezanê yê ku di sala 1966an de ji hewayê hatiye kişandin.

Tê de eşkere dibe ku taxên Kaynartepe (1), Muradiye (2), Fatih (3) û Körhatê (4) bi piranî bûne bajar. Di dîmena vê herêmê de avahiyên nizam, hêşinahî (keskahî) û erdên ji xanî û avahiyên vala ber çavê mirov dikevin. Paşê di wêne de Bûlwara Qerejdaxê (5) jî tê dîtin ku yek ji cadeyên sereke yên bajêr e. Rêya ku weke “Cadeya Penaberan” (6) jî tê binavkirin û hikumetê tirkên bûlgar lê bi cî kirine, li seranserê wê rêyê komek xanî jî tên dîtin. (Daîreya Îmar û Bajarvaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê)

9. "Li Diyarbekirê ji sedî 33yê xelkê li koxikên bêdestûr diji", *Sesin*, 28.12.1974.

10. "Li Rezana bi 60 Hezar Niştעיhi li Binkeya Tenduristiye Bijêşê Tune Ne", *Yeni Zaman*, 08.05.1974.

11. Li pênc nûçeyên rojnameya *Yeni Zaman Gazetesi* yên ku di navbera 1974-1976an de tîn weşandin, der barê serjimara Rezanê de agahî tîn dayin. Di van nûçeyan de tê gotin ku serjimar, li gorî rêzê, bûye şeşt hezar, pêncî hezar, sih û pênc hezar û di du nûçeyan de jî tê gotin ku serjimar jî şeşt hezarî zêdetir e.

12. "Niştעיhiên Cadeya Sunay a Rezanê dibêjin eger rêyên wan neyên çêkirin, ew ê li dijî şaredariyê dest bi berxwedanê bikin", *Yeni Zaman*, 15.10.1974.

13. "Bajarvaniya Çexlawarî", *Gûneydoğu Mesajı*, 01-10.09.1995.

van koxikên bêdestûr dijin.⁹ Serdemekê hîna pir zû ya wekî sala 1974an tê gotin ku Rezan "yekane herêma hilbijartinê ye ku di hilbijartinên şaredariyê de çarenivîsa hilbijartinê diguherîne".¹⁰ Tevî vê yekê jî, gilî û gazind hene ku xelkê Rezanê bi tenê hatiye hiştin. Her çi qasî ku agahiyên teqez û diyardirî nebin jî li ser serjimara Rezanê ya salên 70yî mirov dikare bibêje ku serjimara wê jî 60.000 hinekî dibuhure.¹¹ Tenêka dibistana seretayî ya Rezanê (Dibistana Seretayî ya Faik Ali), tenêka dibistana navîncî (Dibistana Navîn a Atatürk) û tenêka binkeya tenduristiye hemû li ser Cadeya Sunayê ne. Niştעיhiên sentê dixwazin ku rêya heta devê çarrêyê were qîrîkirin da ku minûş û otobus bikarin bi rehetî di cadeyê re derbas bibin û ji bo vê yekê daxwaznameyekê didin şaredariyê û hişyariyê didin wan ku eger rêya cadeyê neyê çêkirin, ew ê pêşiya rêya trafikê bigirin.¹²

Li gorî rojnameyên bajêr, pêvajoya berbelavbûna koxikên bêdestûr di salên 1977-1978an de dest pê dike û piştî ku gundên kurdan jî ber sedemên ewlekariyê tîn valakirin, mirovên ji van gundan koçberbûyî vê pêvajoyê bileztir dikin.¹³

31 Temmuz 1940
Cargamba

Yine yurdun
bir çol çar yollarında
yar yar sarıdır oldu

15.10.1974

Bütün cepheleer hawa
fayeli
devam ediyor

Fransadaki
rejim
değiştiği

Hitlein
savasi eleri

DIYARBAKIR

— R. KALİ —

BAGLAR

15.10.1974

Bütün cepheleer hawa
fayeli
devam ediyor

Fransadaki
rejim
değiştiği

Hitlein
savasi eleri

15.10.1974

Bütün cepheleer hawa
fayeli
devam ediyor

Fransadaki
rejim
değiştiği

Hitlein
savasi eleri

Bazi vatandaşlarımızın
Dileği

Başlar maykê bir mehabîla halîne
Gatîlmezmi?

15.10.1974

Bütün cepheleer hawa
fayeli
devam ediyor

Fransadaki
rejim
değiştiği

Hitlein
savasi eleri



Wêneyê Rezanê yê di sala 1976an de ji hewayê hati kişandin. Her ku cih di taxên berê de namîne, li taxên berbajari cihûwarên nû derdikevin holê ku ji hev dûr û belawela ne û niştcehan ew bi îmkanên xwe ava kirine. Balafirgeha leşkerî ya li başûrojawa (1) û binkeya leşkerî ya bakurrojhilat (2) pêşiyê li berfirehbûna bajêr digirin. Li aliyê bakurrojawa girtîgeha nû ya Amedê (3) tê dîtin ku avakirina wê hê ji temam nebûye û bi piranî di nava zeviyan û cihûwarên belawela de ye. Li bakur Rêya Rihayê xuya dike. (Daîreya Îmar û Bajarvaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê)

14. “Nivê bajêr bêdestûr e”, *Diyarbakır Gün*, 21.01.2004.

15. Girîngiya Amedê ya di tevgera kurd de vedigere heta serhildanên serdema dereng a Osmanîyan û serdema destpêkê ya Komarê. Piştî lidarxistina Mîtingên Rojhilatî di salên 1960î de û avabûna Navendên Çandî yê Şoreşger ên Rojhilatî (*Devrimci Doğu Kültür Ocakları*), ev xurttir bû. Lê belê, DDKO di dema 12ê Adarê de tê girtin.

Hemaheng bi nihêrîn û nêzîkatiya serdest a wê demê, berbelavbûna koxikên bêdestûr weke çavkaniya bêkarbûn, xerîbbûn, pîrsgirêkên civakî û sûcên edlî tê dîtin. Gotin ew e ku guhertinên neyînî yê pêşîn ên di tevna bajarî de li salên 1970yî pêk tên û ev pêvajoyê bi metafora xirabbûnê tê ravekirin.¹⁴

Di vê serdemê de rêxistinên kurd bi teza xwe ya “Kurdistan mêtîngehek e” ji rêxistinên çepa tirk xwe cuda dikin û wisa xwe rêxistin dikin. Di sala 1977an de namzetê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê Tirkîyê (PSKT) Mehdi Zana bi awayekî serbixwe dikeve hîlbijartinan, di encamê de weke Serokê Şaredariya Amedê tê hîlbijartin û bi vê yekê re gaveke girîng tê avêtin ku nasnameya kurdan li meydana siyasê li ber çavan be û di asta herêmî de were temsîlîkirin.¹⁵ Salek bi şûn de, li navçeya Licê ya Amedê PKK tê avakirin ku prensîbên Marksîzm û Lenînîzmê qebûl dike û li herêmên kurdan têkoşîna li dijî mêtîngeriye bi rêk dixwe.

Pevçûn, bêwarkirina bi girseyî û bajarbûna lezgîn (1980-1999)

Derbeya leşkerî ya 12ê Îlona 1980yî dibe sedema bînpêkirinên mafên mirovan ên berbelav. Girtîgeha Leşkerî ya Hejmara 5an dibe sembola hovîtiya vê derbeyê ku hîmên wê di sala 1972yan de li cihekî dûredest ê Rezanê tê danîn û di nûçeyan de bi vê serenavê mîzgîniya wê tê xwestin: “Diyarbekirî êdî dibin xwedanê girtîgeheke modern”.¹⁶ Piştî derbeyê, Mehdi Zana 14 salan di girtîgehê de tê ragirtin. Ji ber îşkence û mîameleyên xirab ên ku li vê girtîgehê li girtiyan tên kirin, ev girtîgeh di bîra civaka kurd de mayinde dibe û hem di geşbûna tevgera siyasî ya kurd de dibe xwedan roleke girîng û hem jî wisa dike ku ji bo tevgera siyasî ya kurd Amed bibe paytextek.

Reveberiya rewşa şer a berî derbeyê tê berfirehkirin û hemû bajar dikevin ber vê şeweya rêvebirinê û piştî li şûna wê, Rewşa Awarte (OHAL) tê danîn. Di 19ê Tîrmeha 1987an de karpêkirinên rêveberiya rewşa şer li Amed, Mêrdîn û Sêrtê tên rakirin û li şûnê, li van deran cara yekem Rewşa Awarte tê ragihandin û peyre jî, ev li hemû parêzgehên kurd tê belavkirin. Ji vê bi şûn de dewlet pevçûnên di navbera Hêzên Çekdar ên Tirk (TSK) û PKKyê dike hincet û dest bi valakirina gundên kurdan dike.

16. “Dê Êdî Girtîgeheke Modern a Diyarbekirê Hebe”, *Sesin*, 08.10.1974.



Wêneyê Rezanê yê di sala 1986an de ji hewayê hati kişandin. Di nivê salên 1980yî de, li navbera robarok û beşên berê yên Rezanê, Rêya Rihayê, Bûlwarê Qerejdaxê erd û zeviyan berê hema hema nemane û li dewsa wan kome-xaniyên belawela û shehayên potansiyel ên avasaziye hene. Cadeya Kedê (1) û Bûlwarê Medîneyê (2) êdî dibin du arterên girîng. Di nîveka van avahiyên bi giştî bêyî plansaziyeke fermî de blokên avahiyan ên plankirî yên wekî Lojmanên Karmendan (*Memur Lojmanlari*) (3) û Îskanewlari (4) jî ber çavê mirov dikevin. Binkeya Polisan a Nû (5) jî tê dîtin (Daîreya Îmar û Bajarvaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê)

17. “Niha jî zehmetiya vegeerê”, *Milliyet*, 28.07.1995.

18. TBMM, “Rapora Lijneya Lêkolînê ya Meclîsê ji bo Lêkolinkirina Pirsgirêkên Hewelatîyên Me yên ku li Rojhilat û Başûrê Anatolyayê ji ber Cih û Warên Valakirî Koçber Bûne û Tesbîtkirina Tedbîr û Bergiriyên Pêwîst (10/25)”, (1998): 11.

19. IDMC, *Internal Displacement Global Overview of Trends and Developments in 2006* (Geneva, 2007), 4, 95.

20. DÎE, 1990 *Serjimara Giştî: Dabeşkirina Îdarî* (Tabloyên Kurtkirî) (Enqere: Weşanên DÎE, 1991), 27.

21. DÎE, 2000 *Serjimara Giştî: Taybetmendiyên Cîvaki û Aborî yên Serjimarê: Amed* (Enqere: Weşanên DÎE, 2000), 62.

Her çend ku li ser valakirina gundên kurdan û bêwarkirina wan a bi zorê ya salên 1990î texmîn gelekî ji hev cihê bibin jî, hemû jî îşaretê bi pîvangeke (bergeheke) mezin dikin. Li gorî daneyên Parêzgarîya Herêmê ya Rewşa Awarte di sala 1994an de, 988 gund û 1.676 gundik hatine valakirin û 50.000 malbat û 311.000 kes di bin bandora vê de mane.¹⁷ Lijneya Lêkolînê ya Meclîsê hejmarên bilindtir êşkere kirine û daxuyandiye ku 905 gund, 2.923 gundik û 3.428 jîngeh hatine valakirin.¹⁸ Li gorî rapora Internal Displacement Monitoring Centre (Navenda Şopandina Bêşûnûwarkirinê ya Navxweyî), texmînen 954.000 an 1,2 milyon kes bi zorê ji cih û warên xwe hatine dûrxistin.¹⁹ Tevî daneyên jev cuda jî, êşkere ye ku bi milyonan kes tûşî pêvajoya bêwarbûnê bûne.

Salên 1992-1994 heyamek e ku ji ber valakirina gundan koçberiya bi zorê herî zêde çêbûye û gelek kesan bar kiriye û hatine Amedê ji ber ku neçar mane ku koçber bibin, lê nexwestine terka war û erdên xwe bikin. Lê belê daneyên serjimarê yên salên koçberiya bi zorê bi tekezî û zelalî bi dest nakevin; ji ber ku tevî ku heta salên 1991î serjimar pênc salan carekê pêk hatine, piştî sala 1990î hatiye ragihandin ku serjimar dê êdî deh salan carekê were êşkerekirin û li wê heyama koçberiya bi zorê ev dane nîn in. Li gorî Enstîtuya Îstatîstîkê ya Dewletê, serjimara navçeya navendî ya Amedê di sala 1990î de 381.144²⁰ e û di sala 2000î de jî 545.983 ye.²¹ Tevî vê yekê jî, di raporeke TMMOBê de hem li ser esasê hebakirina zêdebûna normal a niştecihan hem jî ya anormal (awarte) di sala 1996an de serjimara navçeya navendî ya Amedê weke

Bilgin: ‘Diyarbakır’ da 20 bin aç var’

DIYARBAKIR’ın Bağlar Belediye Başkanı **Ahmet Yağmur**, yiyecek dağıtımındaki izdihâm nedeniyle İdadîmî **Kemal Polat**’ı suçlayarak “Yardımları tespit edilen adreslere verelim diye yalvardım, ama kabul etmedi. İzdihâmı seyredip güldüyordu, hoşuna gidiyordu” dedi. **Polat** gıda yardımını dün kendi ilçesi Eğil’de sürdürürken, paketlen bu kez korucu ve asker denetiminde dağıtıldı.

BU KEZ OLMADI

600 bin nüfuslu Bağlar’da 400 bin kişinin yardıma muhtaç durumda olduğunu kaydeden **Yağmur**, çamur deryası içindeki yiyecek dağıtımında yaşanan izdihâmı **Polat**’ın neden olduğunu ileri sürdü. **Yağmur** “Hiç kimse yardım almaz, kırı vatandaşlarımızın onurlarıyla oynamaya hak

ku yok” diye konuştu. 320 poşetlik gıda yardımıyla geldiği ilçede bakanlar gibi karşılanan **Polat**, yaptırıldığı caminin insanları geçerek vatandaşlarla görüşti. Belediye binası önünde yardım dağıtılırken, bir bölük asker ve korucu onlem aldı. Erzak poşet-

leri, güvenlik güçlerinin kuvvetlerinin gözetiminde izdihâm yaşanmadan kaymakamlıkça belirlenmiş kişilere dağıtıldı.

Diyarbakır Büyükşehir Belediye Başkanı **Ahmet Bilgin** her gün yüzlerce aç insanın kapısını çaldığını belirtti-

rek il ve ilçelerde belediyelere kayıtlı 20 binin üzerinde aç insan olduğunu söyledi. **Diyarbakır**’ın bölgesinde aç çok göç alan il olduğunu kaydeden **Bilgin** pansuman tedbirlerle bir yere varılmayacağını, sorunların günden güne büyüdüğünü vurguladı.

Şeyhmus ÇAKAN, Namık DURUKAN, Mehmet TÜRK - DIYARBAKIR

“Bilgin: ‘Li Diyarbekirê 20 hezar kes birçi ne’”, *Milliyet*, 18.01.1997.




Wênayê Rezanê yê di sala 1992yan de ji hewayê hati kişandin. Li taxên nû yên wekî 5 Nisan (1), Şeyh Şamil (2) û Mevlana Halitê (3) fealiyeteke pir zêde ya avakariyê tê dîtin. Ne tenê avahiyên ku xelkê taxan berê bi îmkânên xwe ava kirine, lê her wisa, blokên mezin ên apartmanan jî tîn kifşê ku miteahidan ew lê kirine. Bajarvaniya bêdestûr li gundên kevin ên Yeniköy (4) û Peyasê (5) û hetta Huzurevleri (6) û Seyrantepeyê (7) jî belav bûye. Li navenda berê ya Rezanê, ya balkêş ew e ku bi taybetî avahî li dev û seranserê rêyên sereke zêde ne û hejmara qatan jî zêdetir dibe; yanê avasazî berev jor diçe. (Daîreya Îmar û Bajarvaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê)

Zêde di ser re nabuhure, li ser Cadeya Santoyê ya Taxa Fatihê avahiyeke heşt-qatî tê xwarê. Ji ber ku hêj ev mal bi kirê nedane kesan, tu kes jiyana xwe ji dest nade. Di lêpîrsîn û vekolînê de derdikeve holê ku şaredariyê destûr nedaye vê avahiya li ser qada hêşinahiyê avabûyî û rayedar balê dikişînin ser problema avasaziya berbelav a bêyî plansazî û nerêkûpêk. Mirov bi piranî guh nadin Rêzîknameyên

24. “Li Diyarbekirê di 14 mehan de 200 koxikên bêdestûr hatin hilweşandin”, *Yeni Yurt*, 09.07.1993.

17



Wêneyê Rezanê yê di sala 1994an de ji hewayê hatî kişandin. Wexta ku mirov dîmena berî niha û vê dide ber hev, ev wêne radixe ber çavan ka di salên 1990î de li Rezanê bajarbûneke çend lezgîn û zêde pêk hatiye. Mirov dibîne ku avahî li navenda berê ya Rezanê, bi taybetî jî rêyên sereke yên wekî kolanên ku girêdayî Bûlwara Qerejdaxê (1) û Dörtölê (Çarrê) ne (2) zêdetir dibin û avasazî jî berev jor (bi awayekî tîk) radibe. Girtîgeh (3) niha bi tevahî bi avahiyan ve hatiye dorpêçkirin ku di destpêkê de li qadeke servekirî bû. (Daîreya Îmar û Bajarvaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê)

avahîsaziye û ji bo avahiyên kêr-qattir destûrê wêrdigirin, lê belê “daîreyên apartmanan” ên pir-tebeqeyî ava dikin, û berî ku destûra wan were derxistin avahî tîr firotanê jî. Dema ku ev avasaziya li navçeyê berdewam e, di 5ê nîsana 1994an de pakêteke bergiriyên aborî²⁵ tê ragirandin û ev hemû însaetên avahiyên dide rawestandinê û avahîsaz gelek projeyan nîvco dihêlin û terka bajêr dikin.

25. Biryarên 5ê nîsana 1994an mesrefên giştî kêr kirine û lêçûnên finansmanê zêde kirine û bi vî rengî jî, sektora avahîsaziye (însaetê) hatiye bêistîkrarkirin. Daxwaza ji bo projeyên avahiyên û ticaretê kêmtir bûye, firmayên biçûk zehmetî kişandine û gelek proje bi derengiyê ketine yan jî hatine ber betalkirinê.

26. “Em bi hesreta avê dinalin!”, *Milliyet*, 02.10.1994.

Rêveberiyên xwecihî li hemberî koçberî û penaberên nû û ji nişkê ve bîyî amadekarî ne. Ji ber tîrnekirina xizmetguzariya tenduristiyê û bînesaziye, li Amedê gelek nerxweşî rû didin. Di sala 1994an de li Rezanê li taxên bi hejmareke zêde ya koxikên bêdestûr bi tenê hefteyê sê yan çar rojan carekê av tê berdan.²⁶ Di van deman de nasnameya siyasî ya taxê bi koçberiya bi zorê teşe digire û ji grevên birçîbûnê heta daxistina derabeyên dikanan, pevçûnên nav kolanan û daxuyaniyên çapemeniyê, gelek çalakîyên protestoyê li vir tîr lidarxistin. Ji navçeyên din ên navendê cudatir, li Rezanê protesto berbelavtir û zêdetir dibin; di vî pêvajoyê de di navbera xwepêşander û hêzên ewlekariyê de pevçûnên tund rû didin. Bajarbûna bi girseyî û bi zorê ya danîştvanên kurd cihê Amedê xurttir dike weke navenda siyasî ya tevgera kurd û Rezan jî dibe binkeyeke kilit a alîgir û piştigiran ji bo partiyên kurd ên nû-seridî.

“Paytexta Hejariyê”, *Milliyet*, 21.01.1997.



Yoksulluğun başkenti

Bağrından bir devlet bakanı yedi Refah milletvekili çıkaran Diyarbakır, açlık, sefalet ve çaresizlik uğrunda ölüm kalım savaşı veriyor. Bağlar semtinde yaşanan erzak trajedisi Güneydoğu'nun gözbebeği kentin acı yüzünü açığa çıkardı.

İşsizlikle kıvranan, boğalan köylerde kabanran, göçlerle taşan kentte üstünkörü barakalarda, teneke evlerde, sağlıksız binalarda yaşayan yüzbinlerce insanın acı gerçeği...
●Ruşen ÇAKIR'ın yazısı 23. sayfa



Dîmena peykî ya Rezanê ku di sala 2002yan de hatiye kişandin. Meydana ku Rêya Hesinî, Rêya Rihayê, Bûlwara Qerejdaxê û rûbarokê sînorên wê diyar kiriye, êdî kapasîteya wê ya avahiyan temam bûye. Parka Koşuyoluyê (1) ku di dawîya salên 1990î de ava bûye, sînorê Rezanê yê rojhilat diyar dike. (Çavkanî: Google Earth)

Rêveberiyên kurd û guherîna bajarî di dema pêvajoya çareserîya siyasî de (1999-2014)

Piştî ku her du partiyên beriya wê tîn girtin, Partiya Demokrasiyê ya Gel (HADEP) tê avakirin û di hîlbijartinên xwecihî yê sala 1999an şaredariyeke bajarê mezin jî tê de di 38 şaredariyan de dibe partiya yekem. Li Amedê Feridun Çelik bi %62,5ê dengan dibe serokşaredar. Ew îmkân zêdetir dibe ku bi rêya şaredarvanî û rêveberiyên xwecihî pîrşîrêkên kurdan bi awayekî berfirehtir bînin rojevîkirin û derfeta çareserkirina wan zêdetir dibe. Karpêkirinên Rewşa Awarte yê bi 12ê Îlonê dest pê kirî piştî ku AKP di 2002yan de tê ser desthilatê, zêde dem di ser re nabuhure, tîn rakirin. Di hîlbijartinên xwecihî yê 2004an de piştî Çelik, Osman Baydemir dibe Serokê DBByê û Yurdusev Özsoğmenler û Cebbar Leygara jî weke Hêvserokên Şaredariya Rezanê tîn hîlbijartin. Di 2008an de Rezan, Sûr, Bajarê Nû û Peyas weke navçe (bajarok) tîn ragihandin. Di hîlbijartinên heman salê de li hemû navçeyên navendê û serokatiya şaredariya bajarê mezin Partiya Civaka Demokratîk (DTP) bi ser dikeve.

Di wê pêvajoya weke “pêvajoya çareseriyê” binavkirî de li herêmên di bin rêveberiya kurdan de gavên girîng tîn avêtin ji bo parastina nasname û çanda kurdan. Navên kurdî li tax û kolanan tîn kirin û kursên zimanê kurdî û çalakîyên çandî tîn zêdekirin û berbelavkirin. Şaredarî her wisa bala xwe dide ser vedîtin/peydakirin û restorekirina mîrasya Amedê. Li nava Sûran, rêveberiyên xwecihî ji bo veguherandina bajarî li taxên hejar ên Alîpaşa û Lalabeyê bi TOKIyê re protokoleke nîqaşbar îmze dikin. Avahîsaziya vê heyamê rê daye ku cudahiya navçînî ya di navbera kurdan de ji aliyê mekanî ve zêdetir û kûrtir bibe.

Li aliyekî din, şaredariyên di bin kontrola kurdan de bi wê yekê jî derdikevin pêş ku gelek piştgirî û alîkariyan didin taxên kêmdahat ku ji bo wan binkeyên xurt ên piştgiriye ne.²⁷ Piştî salên 1990î li Rezanê di warê bînesaziye de pêşketinên hêjayî gotinê pêk tîn û xizmetên bingeîn ên wekî veguhastin, paqîjiya kolanan û kontrolkirina paşmayî û çopan zêdetir berdest dibin. Rêveberiyên xwecihî piştgiriye didin hewil û xebatên hevîgirtinê li vê navçeya ku bi rêjeyeke bilind a bêkarî, hejarî û gelek kesên bêwarkirî teşe girtiye û wan kesan ku çavkaniyên xwe yê debarkirinê yê li gundan ji dest dane. Weke nimûne, ji bo dabînkirina pêdiviyên cil û bergên niştecîhan di 2007an de Maxezeya Alîkarî û Hevîgirtinê ya Gûnîşîgî (*Gûnîşîgî Yardımlaşma ve Dayanışma Mağazası*) tê vekirin.

27. Partiya DEMê û partiyên beriya wê li navçeya Rezanê di hîlbijartinên xwecihî de li 2009, 2014, 2019 û 2024an bi rêzê %68,10 (DTP), %58,56 (BDP), %70,33 (HDP) û %71,83 (Partiya DEMê) deng wergirtine.

Tevî van hewildan û xebatên wan ên bergeh-biçûk şaredariyên bi pêşengtiya kurdan naqedînin ku Rezan û cihên ku koxikên bêdestûr lê hene başkirineke berfireh pêk bînin. Li şûna vê, bi Plana Rêkûpêkirina Avakariyê re ku di dema Osman Baydemir de hatibû erêkirin, çarçoveyek hatibû danîn û li gorî vê, dê bi piranî bajar bihata mezinkirin. Di nava salan de li semtên wekî Peyas û Rezana Nû (Yeni Bağlar) blokên bilind ên avahiyên hewş-girtî û bûlwarên fireh derdikevin holê ku kesên ku mala xwe ji Rezanê bar kirine jî di nav de, ev der ji aliyê çîna navîn ve tîr tercîhkirin. Wan deman, di 2012an de çawa ku hê bi tenê çend meh di ser re derbas dibin ku Qanûna Veguherandina Bajarî ya 6306an dikeve meriyetê, Osman Baydemir Ali Ağaoğlu dide rex xwe, ku weke qralê xeyrîmenkûlan tê nasîn, û bi hev re li cadeyêke sereke ya taxa Kaynartepeya Rezanê digerin. Rezan di çavê tevgera siyasî ya kurd de jî her ku diçe weke navçeyekê tê dîtin ku êdî nikare were rizgarkirin û divê bi tevahî were hilweşandin û ji nû ve were avakirin.

“Li Diyarbakirê
Merasîma Vekirinê
ya Bi Govendê”,
Milliyet, 16.12.2005.



Diyarbakır'da halaylı açılış


Diyarbakır'ın Bağlar Belediyesi'nce yaptırılan "Kadın Yaşam Parkı" ile park içinde yer alan yapılan anıtın açılış töreni dün yapıldı. Açılışa katılan Diyarbakır Büyükşehir Belediye Başkanı Osman Baydemir, kadın - erkek arasındaki ayrımcılığın ortadan kalkmasıyla toplumsal barışın sağlanabileceğini söyledi. Baydemir ve Bağlar Belediye Başkanı Yurdusev Özsoğmenler, açılışın ardından kadınlarla birlikte parkta halay çekti. ■ **DIYARBAKIR AA**

Dîsa pevçûn û veguherandina bajarî (2014-2024)

Piştî Bihara Ereban a 2011an, geremol û nearamiya herêmî, nexasim jî, şer û pevçûnên li welatên cîran ên wekî Irak û Sûriyeyê bandoreke mezin li ser tevgera kurd jî, li ser Amedê jî dike. Dewleta Îslamê ya Iraq û Şamê (DAÎŞ) di havîna 2014an de komkujiyekê tine serê Êzidiyan û 5.000 kesan dukuje û bi deh hezaran kesan jî cih û warên wan dûr dixê. Kesên ku neçar bûne ku ji cih û warên xwe birevin, gelek jî wan li Kampa Fîdanlikê ya li Amedê tên bicîkirin. Di îlon an cotmeha 2014an de DAÎŞê êrîşî Kantona Kobaniyê ya li herêma Rojava kir ku ji aliyê Yekîneyên Parastina Gel-YPG/Yekîneyên Parastina Jinan-YPJyê ve tê parastin. Siyasetmedarên HDPyê daxwaza vekirina korîdoreke mirovî dikin ji Tirkîyeyê û ew jî vê qebûl nake û di encama vê de xwepêşandan û pevçûnên tund pêk tên ku li gorî raporên Komeleya Mafên Mirovan di van de 46 kes jiyana xwe ji dest didin. Di vê heyamê de li Rezanê xwepêşandanên gurr û pevçûn rû didin.

Di dema kampanyaya hîlbijartinê ya 2015an de li Meydana Îstasyonê ya Amedê mîtinga HDPyê tê bombekirin û di encamê de 5 kes jiyana xwe ji dest didin û ji 400î zêdetir kes jî birîndar dibin. Du roj bi şûn de di 7ê Hezîrana 2015an de HDP %13ê dangan distîne û dike ku AKP di parlamentoyê de serdestiya xwe ya hejmarî ji dest bide. Hevdiîtinên ji bo avakirina koalîsyonê bi ser nakevin û di 1ê mijdarê de dîsa hîlbijartin tê lidarxistin. Di navbera her du hîlbijartinan de Komkujiya Pîrsûsê û li Îstasyona Enqereyê komkujiya 10ê Cotmehê pêk tên ku DAÎŞ berpirsyariya pêkanîna van her duyan jî hildigire ser xwe. Piştî ku Erdoğan piraniya li parlamentoyê dîsa bi dest dixê, dibêje wî pêvajoya çareseriyê ya Newroza 2013yan rakirîye sarincê.

Paşê, di sala 2015an de, di hin herêmên parêzgehên kurdan de meclîsên gel “xweseriyê” îlan dikin. Bi zêdebûna kel û ragêşiyê re, artêşa tirk herêmên bajarî yên ku milîtanan barîkat lê çêkirine dorpêç dike û hikûmet di 11 parêzgehên kurdan de, 214ê wan bi tenê li Amedê, serhev 381 biryarên qedexeya derketina derve radigihîne û ferz dike. Ji çîleya 2015an heta adara 2016an, dorpêçkirina çend taxên herêma dirokî ya nava Sûrên Amedê vê herêmê bi giştî wêran dike û dibe sedem ku nêzîkî 20.000 kes jî cih û warên xwe bîr dîrxistin. Zêdetirî van kesan jî Sûrê ber bi Rezanê diçin, ku cihêkî penahê yê dîyem e ji bo gundiyan ku di salên 1980 û 1990î de bi zorê ji warên xwe hatibûn dîrxistin. Di vê navçeyê de ku kel û ragêşî lê zêdetir dibe, tê gotin ku niştecihên vê herêmê ji ber tirsê



Dîmena peykî ya Rezanê ku di sala 2023yan de hatiye kişandin.

Li rojava, avasaziya nû ya li “Rezana Nû” berbiçav (1) e; li bakur jî, li Peyasê (2) bajarbûneke zêde heye. Erdhejên 2023yan kir ku gelek avahî hilweşîn û bi taybetî, li herêmên wekî 5 Nisan (3), Şeyh Şamil (4) û Mevlana Halit (5) bandora van erdhejan hê jî li ber çavan e. Li Kaynartepeyê (6) valahiyên nav avahiyên di ber hev de çêkirî hem hilweşandina ji ber erdhejê hem jî hilweşandinên têkildarî projeyên veguherandina bajêr nîşan didin (Çavkanî: Google Earth)

zêdetirbûna bûyerên tundiyê, bi awayekî demkî navçeyê vala kirine. Rezan her wiha ji bo wan penaberan jî bûye penagehek ku ji ber şerê navxweyî yê Sûriyeyê û êrişên DAÎŞê.

Piştî ku teşebûsa derbeyê ya 15 Tîrmehê bi ser nakeve û wisa bi dawî dibe, rewş xerabtir dibe. Nûnerên siyasî yên kurdan bi komî tîr girtin, Hêzên Çekdarî yên Tirk operasyonên navwelatî didin destpêkirin li dijî hêzên kurd û Amed û Rezan jî tê de li şûna şaredarên bi dengên gel hatî hilbijartin qayûm tîr danîn.

Di vê çarçoveyê de, di sala 2021ê de, hikumeta tirk planên xwe yên “veguherandina bajarî” yên ji bo Rezanê eşkere dike. Tê plankirin ku proje li nêzikî Dörtölê li Kaynaratepeyê dest pê bike, ku navenda Rezanê ye û di demên alozî û pevçûnan de gelek çalakî lê çêdibin. Wekî ku li seranserê Tirkiyeyê jî berbelav e, ev projeya “veguherandina bajarî” jî tê wê wateyê ku avasaziya taxê dê ji binî ve bête xirabkirin û yeke nû dê lê bête danîn; piştî ku astengiyên huqûqî ku derdikevin pêşberî rayedaran û saziyên civaka sîvil jî li dijî wê derdikevin, ev proje tê rawestandî. Tevî ku ev proje hatiye rawestandî jî, bi tevahî dest ji vê projeyê nehatiye berdan.

Di vê pêvajoyê de, hin herêmên navçeyê bi rewşeke xerabtir re rû bi rû ne ji ber erdhejên mezin ên sala 2023yan ku li Rezanê bûbûn sedema ziyaneke mezin. Yê ku derfeta ji navçeyê derketinê bi wan re heye hê jî bi berdewamî ber bi taxên derveyî yên bajêr ve diçin ku berfirehtir û mezintir dibin û Rezan jî her ku diçe zêdetir mîvandariya wan kesên dike ku herî feqîr in û aidê komên civakî yên herî zêde vederkirî ne. Hem rayedar hem jî rûniştvanên herêmê li ser vê yekê li hev dikin ku hewce ye ku li Rezanê mercên jiyanê bêne qenckirin, lê belê hê jî planeke diyar nehatiye danîn ku bikare bi berdewamî were tetbîqkirin.

Panoya Reqlamê
ku tê de agahiya
veguherandina
bajarî tê dayîn,
Rezan, 2020.



Ji hêla demê ve rêzkirina bûyerên girîng ên ku bandor li Rezanê kiriye

1940

Rezan li rojnameya “Diyarbakır”ê hat weşandin.

1947

Qeyrana Avahiyan – Ji ber Qeyrana Avahiyan li derveyê sûran ji bo karmendan nêzikî pêncî avahî hatin çêkirin.

1952

Şaredariya Bajarê Amedê ji bo çûn û hatina Rezanê seferên otobusan dan destpêkirin.

1969

Navendên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilatî (Devrimci Doğu Kültür Ocakları) hat avakirin – Navendên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilatî ji hêla rewşenbîr û çalakvanên kurd ve ji bo têkoşîn û parastina nasname, çand û mafên Kurdan hatin avakirin. Ev rêxistin piştî derbeya leşkerî ya 1971ê hat fesihkirin.

1971

Muxtireya 12ê Adarê – “Derbeyeke nerm” a leşkerî hikumet ji erkê xwe anî xwarê, pêkutî û zexta li ser teygerên çepgir zêdetir kir, azadî bi sînor kirin û asta tundiya di navbera cemserên siyasî de zêdetir kir û bi vî rengî, hino hino teşe da atmosfera siyasî ya nesekan û guherbar a Tirkîyeyê 1970yan.

Di salên 1965-1967an de ji bo herêmên li derveyê sûran û hundirê sûran planên bi pîvanga 1/1000ê hatin amadekirin û ev plan hatin fermîkirin – Bi vî plansaziyê, planên Herêma Bajarê Nû hatin revîzekirin û hat pêşniyarkirin ku Herêma Rezanê û qada leşkerî ya îroyin bibin cihê berfirehbûn û mezinbûna bajêr.

1972

Li Rezanê avakirina Girtîgeha Amedê hat destpêkirin.

1974

Rapora Amedê ya Koxikên Bêdestûr (Diyarbakır Gecekondur Raporu) – Mekin Sarioğlu yê Cigirê Parêzger di raporê de eşkere kiribû ku li Amedê 12.000 koxikên bêdestûr hene û %33ê niştecihên bajêr di van koxikan de dijîn.

1977

Mehdi Zana weke Serokê Şaredariya Amedê hat hilbijartin – Piştî ku Mehdi Zana weke Serokê Şaredariya Amedê hat hilbijartin, bû yekemîn serkirdeyê neteweperwer ê kurd ku bi awayekî eşkere nasname û mafên Kurdan diparêze. Di dema serokşaredariya xwe de rastî pişkinî û zexteke zêde hat û piştî derbeya leşkerî ya 1980yî hat girtin.

1978

Avabûna PKKê.

Mîameleyên rewşa awarte dest pê kir – Rewşa awarte ya ku li sêzdeh bajarên kurdan hatibû ragihandin salek bi şûn de hat berfirehkirin û li nozdeh bajarên derbasdar bû.

1980

Girtîgeha Leşkerî ya Hejmara 5an a Amedê hat

vekirin – Girtîgeha Leşkerî ya Hejmara 5an a Amedê hat vekirin. Ev girtîgeh li Rezanê hatibû avakirin.

Derbeya Leşkerî ya 12ê Îlonê – Artêşê bi serkêşiya Kenan Evren hikumet ji peywirê gêr kir û rewşa awarte ragihand; wê azadî berteng û serkut kirin, bi dehan kes girtin, tevgerên kurd ji xwe re kirin armanc û makezagonê zorker û çewşîner kir meriyetê ku bi dehan salan teşe da siyasetê.

Dagirkirina Iraqê bi destê Îranê / Destpêka şerê Îran û Iraqê.

1982

Makezagona 1982yan – Ev makezagon di bin rêveberiya leşkerî de hat amadekirin û di giştîpirsiya (referandûma) makezagona nû de bi %92yê dangan hat pejirandin.

1983

Qanûna Rewşa Awarte (OHAL) hat erêkirin.

Turgut Özal weke serokwezîr (ANAP) hat hilbijartin.

1984

Qanûna bi Hejmara 2981ê, “Efû / Bexşandin ji bo Koxikên Bêdestûr”.

Yekem çalakiya çekdarî ya PKKê.

1985

Pergala parêzvaniya demkî ya gundan hat destpêkirin.

1987

Avakirina “Herêma Rewşa Awarte”, Parêzgeriya Herêma Rewşa Awarte – Parêzgehên weke Çewlik, Amed, Xarpêt, Cölemêrg, Mêrdîn, Sêrt, Dêrsim û Wan li herêma rewşa awarte hatin zêdekirin û bi pey van jî Semsûr, Bedlîs û Mûş weke parêzgehên cîran lê

hatin zêdekirin. Di sala 1990î de piştî ku Batman û Şîrnex jî bûn parêzgeh, hejmara van parêzgehan gihaştê 13an.

Fermadariya Cendermetiyê ya Îstîxbarat û Dijeterorê (JITEM) hat avakirin.

1988

Peymana li ser “Pêşîlêgirtina Îşkenceyê û Reftar û Sizayên Dermirovî û Biçûkker” hat îmzekirin.

Li Başûrê Kurdistanê / Iraqê, Operasyona Enfalê û Komkujiya Helebceyê – Di Adara 1988an de balafiran bi gazên kîmyewî yên jehrî bajarokê Helebceyê bombardûman kirin. Zêdetirî 5.000 kesên jiyana xwe ji dest da û nêzîkî 10.000 kesên sîvil hatin birîndarkirin.

1990

Partiya Kedê ya Gel (HEP) hat avakirin – Yekemîn temsîlkarê tevgera siyasî ya kurd li Tirkîyê, Partiya Kedê ya Gel (HEP) hat avakirin.

Destpêka Yekemîn Şerê Kendavê.

1991

Qetilkirina Vedat Aydın – Siyasetmedarê kurd û parastvanê mafê mirovan Vedat Aydın hat binçavkirin û piştî cinyazê wî hat dîtin; hizir her wisa bû ku JITEM berpirsyarê vê kuştinê ye.

Merasîma sondxwarinê ya Leyla Zana yê.

1992

Li Cizîrê di 1992yan de Komkujiya Newrozê – Li Cizîrê di dema pîrozbahiyên Newrozê de 57-120 kes hatin kuştin.

Zêdebûna valakirina gundan li bajarên Kurdan – Li gorî dane û daxuyaniyên Wezaretê

Karên Hundirîn di sala 1995an de li herêma Rojhilat û Başûr de serhev 982 gund û 1674 gundik (mezra) hatine valakirin.

1993

Operasyonên li Amed û Çewlikê – Hêzên Hewayî yên Tirk li herêma di navbera Amed û Çewlikê de operasyonê hewayî pêk anîn. Di encama operasyonê de 150 PKK'yî mirin.

Ji hêla PKK'yê ve agirbesteke yekalîyî hat ragihandin.

Şaredariya Amedê weke Şaredariya Bajarê Mezin hat destnîşankirin.

Li Rezanê hilweşandina “koxikên bêdestûr” – Raporan eşkere kir ku nîvê niştecihên Amedê li koxikên bêdestûr dijîn, li taxa 5 Nisanê 200 koxikên bêdestûr hatin hilweşandin.

1994

Şaredariya Rezanê weke şaredariyeke “pêgeh-nizim” hat diyarkirin.

“Projeya Gundê Navendî” hat îlankirin – Piştî ku gund hatin valakirin, hikumeta Tansu Çillerê di mijdara 1994an de “Projeya Gundê Navendî” ragihand.

1995

Parka Koşuyoluyê hat avakirin.

“Projeya Vegera li Gundan” hat ragihandin.

1996

Di Girtîgeha Amedê de serhildan – Di serhildana Girtîgeha Amedê de 8 girtî mirin.

1997

Operasyona Çakûç – Hêzên Çekdarî yên Tirk derbasî Bakurê Îraqê bûn û midaxilî serê navxweyî li navbera hêzên

Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Mesut Barzani û hêzên Yekîtiya Nîstimanî ya Kurdistanê ya Celal Talabani bûn da ku di wê navberê de yekîneyên PKKê ji holê rakin. Nêzikî 1.200 mîltanên PKKê hatin kuştin.

1998

Rapora Meclîsê ya li ser Gundên Valakirî – Di 14ê Çîleya 1998an de “Rapora Lijneya Lêkolînê ya Meclîsê ji bo Lêkolinkirina Pirsgrêkên Hewwelatiyên Me yên ku li Rojhilat û Başûrê Anatolyayê ji ber Cih û Warên Valakirî Koçber Bûne û Tesbîtîkirina Tedbîr û Bergiriyên Pêwîst” bo TBMM'yê hat pêşkêşkirin û radestkirin.

1999

Öcalan li Kenyayê hat girtin – Di 15ê Sibata 1999an de bi alîkariya rêxistinên îstîxbaratê yên navneteweyî rayedarên tirk rêberê PKKê Abdullah Öcalan li Naîrobiya paytexta Kenyayê desteser kir.

“Projeya Vegera li Gundan û Rehabîlîtasyonê” hat ragihandin – Weke dûmahîka projeya Gundê Navendî, di sala 1999an de “Projeya Vegera li Gundan û Rehabîlîtasyonê” (bi kurtenavê xwe yê bi tirkî “KDRP”) hat destpêkirin. Vegera li gundên valakirî bi awayekî berhemdar pêk nehat ji ber ku şert û mercên pêwîst nehatibûn cih, hikumeta tirk bawerî nedida û ji ber ku kesên ji gundên xwe koçberbûyî tûşî zext û pêkûtiya rayedaran bûn ku di qeydên fermî de wê agahiyê bidin ku wan gundê xwe ji ber terorê vala kiriye.

Cara yekem e ku HADEP şaredariyeke bajarekî mezin bi dest dixê (Amed: Feridun Çelik).

2002

AKP hat ser desthilatê.

Rewşa Awarte (OHAL) bi dawî bû.

2004

Osman Baydemirê BDPyî weke Serokê Şaredariya Amedê hat hilbijartin.

Li Rezanê Mala Jinan a Kardelenê hat vekirin.

2005

Pêvajoya endamtiya Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewropayê dest pê kir.

2006

Plana Rêkûpêkkirina Avakariyê ya bi pîvanga 1/25.000î hat pejirandin û ket meriyetê.

2007

Kooperatîfa Jinan a Rezanê hat avakirin.

Li Rezanê Dikana Alîkarî û Hêvgirtinê ya Gûnîşîgî hat avakirin.

Muxtireya Elektronîk (Daxuyaniya Elektronîk a 27ê Nîsanê).

2008

Rezan, Sûr, Bajarê Nû (Yeni Şehir) û Peyas (Kayapınar) weke navçe hatin ragihandin
– Li ser esasê qanûna 5747an, li gorî biryara avakirina navçeyan di navsînoren şaredariyan de Rezan, Sûr, Bajarê Nû û Peyas weke navçe hatin qebûl kirin û ragihandin.

Doza Ergenekonê.

2009

TRT6ê dest bi weşanê kir.

Ji ber ku di komcivînê de bi kurdî axivîne li hemberî Demirtaş û Ahmet Türk lêpîrsîn hat destpêkirin.

Ji ber ku mîltanên PKKê weke gerîlla bi nav kiriye, sîza li Osman Baydemir hat birîn.

Berxwedana Karkerên TEKELê.

Pêvajoya ji bo çareserkirina pîrsgirêka kurd.

2010

Gîştîpîrsiya (Referendûm) li ser Guhertina Makezagonê.

2011

Şoreş û şerê naxweyî yê Sûriyeyê dest pê kir.

Erdheja Wanê – Di 23yê Cotmehê de bi taybetî li Wan û Erdîşê erdhejêke bi pileya 7.1ê pêk hat ku bû sedema xîsar û hilweşîneke mezin. Ji 600î zêdetir kesî jiyana xwe ji dest da.

Komkujiya Roboskiyê
– Firokeyên şer ên dewleta tirk li herêma nêzîkî sînore Iraqê komek gundiyan kurd bombebaran kir ku ji aliyê din ê sînor kelûpelên firotinê dianîn û di encamê de 34 gundiyan jiyana xwe ji dest da.

2012

Qanûna 6306an a li ser Veguhartina Cih û Warên di bin Rîska Erdhejê de hat pejirandin.

Serokşaredar Osman Baydemir axa û dewlemendê avahî û xeyrîmenkulan Ali Ağaoğlu ji bo meş û geryanê bir navçeya Rezanê.

2013

Newroza Amedê ya 2013an – Li Newroza Amedê, Daxuyaniya Ocalan a 2013an hat xwendin.

Berxwedana Geziyê – Piştî ku di çarçoveya 'Projeya Peyarêkirina Taksimê' de çend darên Parka Geziyê hatin hilkirin, Hêvgirtina Taksimê bi

komeke 40-50 kesan li parkê kon vegirtin û ev kes heta sibehê li wir şeveder bûn û bi vî awayî vê bexwedanê dest pê kir. Di 31ê Gulanê de piştî zêdebûna midaxeleyên polîsan ev bûyerên li Stenbolê girtir û berbelavtir bûn û xelkê gelek parêzgehên din jî piştgiri da van çalakîyan.

Bazara Semtê ya Jiyanê – Şaredariya Rezanê yekemîn bazara semtê ya Amedê vekir.

2014

Li Amedê Kampa Fîdanlikê hat avakirin – Wexta ku komkujîya bi destê DAIŞê dest pê kir, Êzîdiyên ji Şingalê koçberbûyî li Kampa Fîdanlikê ya li Bajarê Nû (Yeni Şehir) hatin bicikirin.

Recep Tayyip Erdoğan weke serokkomar hat hilbijartin – Li hilbijartina yekem a ku tê de serokkomar bi dengên gel hat diyarkirin, Recep Tayyip Erdoğan %52yê dangan wergirt û ji nav sê namzetan weke serokkomar hat hilbijartin.

Bûyerên Kobaniyê – Çaxa ku li Sûriyeyê YPG/YPJyê li Kobaniyê şer dikir ku ji hêla DAIŞê ve hatibû dorpeçkirin, Erdoğan gotibû “Kobanî yan ket yan jî hindik maye ku bikeve”; piştî van gotinan wî li Kurdistanê Tirkîyeyê xwepêşandanan rû da û di pevçûnan de 46 kes mirin.

2015

Demîrtaş: “Em ê te nekin serok!”

Li Amedê berî bi hilbijartinan li mitînga HDPyê êrişek pêk hat û bombeyek hat teqandin.

Hilbijartinên Giştî yên 7ê Hezîranê – HDPyê %13ê dangan bi dest xist û hejmara parlamenterên wan gihîşt 80yî. Ev cara pêşîn bû ku AKPyê li parlamentoyê piraniya mitleq ji dest da.

Sûrên Amedê û Baxçeyên Hewselê li lîsteya UNESCOyê ya “Mîrasa Çandî ya Cihanê” hatin zêdekirin.

Teqîna li Pîrsûsê – Li navçeya Pîrsûsê ya Rihayê, xwekujekî bi teqandina bombeyekê êrişî komeke aktivîstên Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst (SGDF) kir ku amadekariyên xwe dikirin da ku alîkariyê bişînin Kobaniyê. DAIŞê berpirsariya vê êrişê wergirt ser xwe ku tê de 33 kesan jiyana xwe ji dest da û 100î zêdetir kes jî birîndar bûn.

Operasyonên Xendekan/ Pêvajoya xweseriyê – Piştî ku li herêmên kurd xweserî hat ragihandin, hikumetê li bajarên kurd û bi taybetî jî li Amed, Cizîr, Nisêbîn, Hezex, Gevê û Şîrnexê midexele kir û di encamê de li van bajaran hilweşandineke seranser û ziyana jiyana jî tê de ziyaneke giran pêk hat.

Erdoğan: “Pêvajoya çareseriyê, êdî me ew rakirîye sarincê.”

Kuşîna Tahir Elçi – Di 28ê mijdara 2015an de parastvanê mafên mirovan û Serokê Baroya Amedê Tahir Elçi li Amedê di daxuyaniyeke çapemeniyê de bi êrişeke çekdarî hat armanckirin û jiyana xwe ji dest da.

Li Enqereyê teqînek qewimî ku di encamê de 103 kesan jiyana xwe ji dest da, ji 500î zêdetir kes jî birîndar bûn.

2016

Hewila Derbeyê – Piştî hewildana şehitî ya derbeya leşkerî li dijî hikumeta Serokkomar Erdoğan, li seranserê Tirkîyeyê desteserkirin û tesfiyeyeke berfireh û mezin dest pê kir.

Operasyona Mortalê Feratê – Artêşa tirk û komên çekdar ên serîhildayî ku girêdayî

Tirkiyeyê ne, hem li hemberî DAIŞê hem jî li hemberî Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) şer dîkin. Piştî ku Tirkiyeyê bakurê Sûriyeyê dagir kir, li seranserê sinorê bi Tirkiyeyê re xetêke tamponê çêbû û wê yekê nehişt ku li Rojava kantonên di bin kontrola kurdan de bibin yek.

Gûltan Kîşanak hat girtin – Hevseroka Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê Gûltan Kîşanak bi “endamtiya PKKyê” hat sûcdarkirin û girtin. Di 26ê cotmehê de bi hezaran xwepêşandêr li ber Avahiya Şaredariya Amedê daxwaz kir ku hevşaredarên wan bên berdan.

Li Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê qeyûm hat peywardarkirin – Gûltan Kîşanak û Fîrat Anlı 25ê mijdarê hatin binçavkirin û li dewsa wan qeyûm hat tayînkirin.

Desteserkirina rêveberên HDPyê – Hevseroka Giştî ya HDPyê Fîgen Yuksekdağ û Selahattin Demirtaş jî di nav de gelek siyasatmedarên HDPyê hatin girtin.

2017

Giştîpirsiya (Referendûm) Makezagonê – Hê şert û mercên rewşa awarte ji holê ranebûyî ev giştîpîrsî pêk hat û li gorî hejmarên hikûmetê dayî bi rêjeyeke %51,4ê denga Sîstema Rêveberinê ya Serokkomariyê ket meriyetê.

2018

Operasyona Şaxa Zeytûnê – Hêzên Çekdar ên Tirk bi hevkarîya Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê şerê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ên girêdayî Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) kir û di encamê de li bakurê Sûriyeyê herêma Efrînê dagir kir ku pîraniya niştecîhên wê kurd in.

Sîstema Serokkomariyê.

2019

Hilbijartinên Cihlî yê 2019an – Adnan Selçuk Mızraklı (HDP) %62,9ê denga wergirt û weke Hevserokê Şaredariya Amedê hat hilbijartin.

Li şaredarên HDPyê qayûm hat tayînkirin – Li şaredariyên Amed, Wan û Mêrdînê qeyûm hat peywardarkirin.

Operasyona Kaniya Aştiyê – Hêzên Sûriyeya Demokratîk ku li bakurê Sûriyeyê xweseriya xwe ragihandibû, Hêzên Çekdar ên Tirk û Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê li dijî wan operasyonêke leşkerî ya dersînora da destpêkirin.

2020

Taxa Kaynartepeyê ji aliyê Serokkomariyê ve weke “Herêma Rîskdar” hat ragihandin.

2021

Kaynartepe weke “Herêma Veguherandina Bajari” hat îlankirin – Piştî ku Taxa Kaynartepeyê weke “Herêma Rîskdar” hat destnîşankirin, Wezareta Bajarvaniyê li wê derê dest bi veguherandina bajari kir.

2023

Erdheja Merezê – Di 6ê sibata de erdhejan rû da ku navendên wan li navçeyên Bazarcix û Albîstanê yê Merezê bûn. Erdhejen ku li Tirkiye, Sûriye û Kurdistanê bi bandor bûn, di wan de nêzîkî 55.000 însanan jiyana xwe ji dest da û ji 100.000î zêdetir kes jî birîndar bûn.

2024

Doğan Hatun û Ayşe Serra Bucak (Partiya DEMÊ) weke hevserokên Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê hatin hilbijartin.

Rezan li
rojnameya
“Diyarbakır”ê
hat weşandin

Di 1965-1967an de ji
bo herêmên derveyî
sûran planên bi
pîvanga 1/1000ê hatin
amadekirin û
fermîkirin.

Li Rezanê
avakirina
Girtîgeha
Amedê hat
destpêkirin

Şoreşa Îranê
Avabûna
PKKê

1950

1960

1970

Şaredariya Bajarê Amedê
ji bo çûn û hatina Rezanê
seferên otobusan dan
destpêkirin

Muxtireya
12ê Adarê

Miameleyên rewşa
awarte dest pê kir

Qeyrana
avahiyan

Navendên Çandî yên Şoreşger
ên Rojhilatî hatin avakirin

Rapora Amedê ya
koxikên bêdestûr

Mehdi Zana weke
Serokê Şaredariye
Amedê hat hilbijartin

Plana Rêkûpêkkirina Avakariyê
ya bi pîvanga 1/25.000î hat
pejirandin û ket meriyetê

Kooperatîfa Jinan a
Rezanê hat avakirin

Li Rezanê Dikana Alîkarî û
Hevgirtinê ya Gûnîşîgî hat
avakirin

Rezan, Sûr, Yenîşehir û
Kayapınar weke navçe
hatin ragihandin

TRT6ê dest bi
weşanê kir

Pêvajoya ji bo
çareserkirina
pirsgirêka kurd

Şoreş û şerê
naxweyî yê
Sûriyeyê
dest pê kir

Komkujîya
Roboskiyê

Qanûna 6306 li ser
Veguhartina Cih û
Warên di Riskê de
hat pejirandin

Newroza Amedê ya
2013an

Bazara Semtê ya Jiyanê

Li Amedê Kampa
Fidanlıkê hat avakirin

Osman Baydemirê
BDPyî weke Serokê
Şaredariya Amedê
hat hilbijartin

Li Rezanê Mala
Jinan a Kardelenê
hat vekirin

“Projeya Vegera li
Gundan û
Rehabîlîtasyonê”
hat ragihandin

AKP hat ser
desthilatê

2000

Pêvajoya endamtiya
Tirkiyeyê ya Yekîtiya
Ewropayê dest pê kir
Rewşa Awarte
bi dawî bû

Yekem car HADEP
şaredariya
bajareke mezin
bidest dixe

Öcalan li
Kenya yê hat
girtin

Muxtireya Elektronîk

Doza Ergenekonê

Giştîpirsiya (Referendûm) li
ser Guhertina Makezagonê

Erdheja
Wanê

Hilbijartinên
Giştî yên 7ê
Heziranê

Berxwedana Geziyê

Bûyerên
Kobaniyê

Sûrên Amedê û Baxçeyên
Hewselê li listeya UNESCOyê
ya “Mîrasa Çandî ya Cihanê”
hatin zêdekirin

Kuşîna Tahir
Elçî


Teqîna
Enqerê

Teqîna li
Pîrsûsê

Operasyonên
Xendekan /
Pêvajoya xweseriyê

Erdoğan weke
serokkomar
hat hilbijartin

Li Amedê berî hilbijartinan li mîtinga
HDPyê êrişeke bombeyî pêk hat.



84/1
CIKMAZ
SOKAK

34 DD 2949

2 Xweragiri, berxwedan û pêkarîn

Rezan cihekî wisa ye ku şerê
niştecihên herêmê yên man
û nemanê, berxwedana li diji
tundiya dewletê û pêvajoyên
ji rêzê yên bajarbûn û
spekulasyona erdan lê digihêjin
hev û dikevin nava hev.

“ Heta 2009-2014an pirsgirêka kehrebayê hebû. Carinan bi hefteyan ceyran nedihat dayîn. Ji bo protestokirina DEDAŞê me agir berdida tekeran û çalakî li dar dixist. Bi taybetî, li taxa Fatihê pirsgirêk zaf bûn. Dema ku me ji pencereya malê lê diniherî, Kaynartepê dihat xuyanê. Li wan deran lembeyên wan her tim vêketî bûn, lê ev der her tim tarî bû.

(Baran, 25 salî, Fatih)

Wexta ku ez diçûm lîseyê ceyran nebû. Saetek dihat û paşê pênc rojan yan 10 rojan nedihat. Ez li ber findê li dersên xwe dixebitîm, pir xirab bû. Heta carekê birayê min li dersên xwe dixebitî, find qediya, hew mabû mase bişewite... Yan jî, belkî heta sê mehan ceyran nedihat. Di dawiyê de mirov gihiştin hev û çûn şirketa kehrebayê. Tê bîra min, li taxa me li her derê ceyran hebû; li dibistana polîsan, li lojmanên karmendan... Bi tenê li taxa me ceyran nebû. Av jî dereng hat çêkirin, gelekî dereng hat çêkirin. Rojêkê dihat, pênc rojan nedihat. Paşê wexta av dihat, ceyran diçû...

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)



“Ceyrana taxa Rezanê êvaran 4 saetan tê birin”, *Güneydoğu*, 07.08.1962; “Taxa Kaynartepêyê ya Rezanê ji Bêavbûnê Bûye Kerbela”, *Yeni Zaman*, 29.06.1974.

Dîroka Rezanê ya bi tundiya dewletê, berxwedanê û hejariyê ve hatiye şewandin, ne tenê bûye cihê têkoşîna debarkirin û starbûnê, her wiha bi dinamikên guherîna bajarî jî hatiye veguhartin. Van pêvajoyan Rezanê kiriye cihê wisa ku hem aliyên zehmet ên berxwedana civakî û hem jî yên bajarbûnê bi hev re û di nav hev de lê hatine tecrubekirin. Lê belê, li ber van zehmetiyên dîrokî jî, divê mirov bizane ka pêvajoyên giştî yên bajarbûna Amedê çawa bandor li Rezanê kiriye û ew li kîjan derê bi cih dibe çaxê ku mirov wê bi herêmên din re dide ber hev.

Beriya pêla koçberiya bi zorê ya salên 1980yî jî, niştecihên Rezanê ji ber binesaziyeke kêmtir û xizmetên civakî yên lawaz gelek zehmetî dikişandin. Koçberiya bi girseyî ya kesên bêwarkirî pêşkêşîya xizmetên bingeîn zehmettir kir. Rê nedihatîn qirkirin û di nav heriyê de bûn, av nedihat berdan û ceyran kêmtir bû. Li dawîya salên 1990î, gava ku HADEP hat ser rêveberiya şaredariyê, mercên jiyânê baştir bûn, lê belê pirsgerêkên binesaziyê berdewam bûn û niştecihên herêmê qutkirina ceyranê protesto dikirin ku heta van demên dawî jî berdewam bû.

Piraniya yên nûhatî, piştî ku milkên xwe, malên xwe, erdên xwe û heywanên xwe yên gund ji dest dabûn, ji ber ku çareyeke wan a din tune bû, bi bihayekî erzan li Rezanê bi cih bûbûn. Di van mercên zehmet de, niştecihên Rezanê bi piranî li ser torên hevrêtiya xwe ya hundirîn xwe diparastin; ji dezgehên derveyî yan jî ji dewletê an pir kêmtir alîkarî wergirtibûn an jî tu alîkarî nestandibûn. Kesên ji gundan hatî derxistin an jî bi rêya derxistina ji gund milkên xwe ji dest dayî li Rezanê bi cih bûn û dest bi jiyânê kirin li cihêkî

 Dema ku HADEP hat, dizî û talan çênebûn. Di dema Turgut Özal de qedexa bû ku alîkarî li Helebceyîyan bê kirin. Di dema Turgut Atalay de [1989-1994] tu planeke îmarê nehat kirin. Me bi xwe jî însaeta xaniyên xwe du mêtro ji milê rastê, du-sê mêtro ji pêşiyê kêmtir kirin ku rê û cade werin çêkirin. Serdema Ahmet Bilgin [1994-1999] baş bû. Her kesî xaniyê xwe ji cadeyê dûr ava kir. Koşûyolû jî wê demê hat çêkirin. Xebatên çandîna daran hatin kirin.

(Galip, 69 salî, Fatih)

Piştî hîlbijartina 1999an, êdî Amed dihat nûkirin, em gelekî jê razî bûn, lê belê nexwestin ku em pêşve biçin û dengê xwe bilind bikin.

(Ferhat, 44 salî, Fatih)

Di hin malan de avkêş hebûn. Ji xwe av problemek bû. Her tim ava me dihat birîn. Ceyran jî her tim dihat birîn – wexta ku ceyran diçû, em şaş nediman.

(Metin, 39 salî, Kaynartepe)

“ Em kirêdar bûn, me zewiyek stand. Ji ber ku erzan bû, me xaniyek çêkir. Bavê min li saziya çêkirina rêyên giştî (Karayollar) dixebitî. Bi mûçeyekê deh kes xwedî dikirin. Dîsa, wê demê bavê min bi mûçeya xwe bi tenê xaniyê me yê wê demê da çêkirin. Me hostayek girt ji bo avakariyê. Wê demê kesekî dikaribû bi mûçeyekê siyareyekê bistîne. Xaniyê me du-qatî bû, 2 ode û salonek tê de hebûn. Plan filan nebû. Te pêşiyê xaniyekî yek-qatî dida çêkirin, piştî wexta pere bi destê te diket, te qata duyem jî li ser zêde dikir. Me wisa kir. Ez di salên 80yî de zewicîm. Me qatek li ser xaniyê xwe zêde kir. Erdê me 105 m2 bû. Li ser 65 mêtroyan xanî hebû, li 40 mêtroyan jî rez hebûn. Di

dema Kenan Evren de ewraqek dan me. Hingê xwediyên xaniyên yek-qatî dihatin ba hev û xaniyên xwe dikirin apartman. Me nexwest, ji xwe pêdiviya me jî pê tune bû. Niha meta min li mala me ya berê rûdine. Kesên ji Kobaniyê hatî çûn. Çendek berî niha jî mirtibên ji Sûriyeyê lê man.

(Galip, 69 salî, Fatih)

Xaniyekî du-qatî bû. Hewşa wê tune bû. Paşê, qateke din lê hat zêdekirin, paşê yeke dîtir. Serhev bûn çar qat. Me wisa kir da ku cihê me firehtir bibe. Paşê me komirxaneyek jî li ser zêde kir. Qatek xizmekî me çêkir, ya din me çêkir. Wexta ku em çûn, me da kirê.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)



“Koçberiya zêde û pîrbûna serjimarê ya lezgîn kir ku Diyarbekir bikeve dirûvê du bajaran”, *Yeni Yurt*, 09.06.1993; “Niştecihên semta Rezanê ev bi mehan e hesreta wan gulmek av e”, *Yeni Yurt*, 14.08.1993.



ji mercên bingehîn ên jiyani mehrûm. Ew kesên li devera koxikên bêdestûr û apartmanên bêdestûr bi cih bûbûn, ji bo debara xwe, bi pirani di sektora avakariyê de û di karên rojane de bi mûçeyên kêr dixebitin.

Zêdebûna serjimara Amedê ya piştî pevçûnên li herêmên kurdan, rast li wê demê hatibû ku di politikayên makro-aborî yên Tirkiyeyê de ji guhartinên mezin pêk dihatin. Lîberalbûna aborî û qanûna 1984an a Destûrdayîna Koxikên Bêdestûr rê da wê yekê ku avahîsazî qada xwe ji hedê xwe zêdetir mezin bike û erd û zevî bibin çavkaniya sereke ya rantê. Di vê çarçoveyê de, bajarbûna bi zorê ya Rezanê hat dema zêdebûna xwedîtiya emlakê û firehbûna sektora avakirinê. Li gel koxikên bêdestûr avabûyî, ku rûniştvanan bi xwe çêdikin, avahiyeke pir-qatî jî zû bi zû bilind bûn û vê bajarbûna bilez hişt ku li layê niştecîhên ji berê de bi cih û war bûyî hinekî jî be tevgera kurd. Kesên ji her quncika herêmên kurdan hatî û

Ji ber vê bingeh û paşxaneyê, niştecîhên Rezanê gelekî siyasî bûne û wê jî ev navçe veguherandiye keleheke simbolîk a tevgera kurd. Kesên ji her quncika herêmên kurdan hatî û



“Diyarbakır dê ji destê bajarvaniya çelaxwarî were rizgarkirin”, *Öz Diyarbakır*, 01.05.1984; “Ji bo efûya îmarê heta niha 12 hezar kesan serî lê daye...”, *Öz Diyarbakır*, 27.08.1984.





Ev der pastexane bû. Dikana welatparêzekî bû. Di salên 90î de ew zîlam tam li hember hate kuştin. Kujerê wî ne diyar bû. Li vî welatî gelek kes hatin kuştin. Wê demê polis gelekî ditirsîyan. Dikandaran her tim derebeyên xwe dadixistin. Em jî beşdarî wan dibûn.

(Galip, 69 salî, Fatih)

Min dibihîst. Min her tim dibihîst. Gelek [çalakî] hebûn... Haya me jê çêdibû. Te dît, wê demê Newroz qedexê bû; ji ber wê mirovan li ser banan û di nav kolanên taxê de pîrozbahî dikirin. Tê bîra min, min ew dîtine. Lê belê serdegirtin û erîş çêdibûn. Min dît, li mirovan didan. Yanê me me didît. Ji ber ku qedexê bû.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

Newroz dibûn, li hemû kolan, li hemû meydanan. Lastîk dişewitandin. Qada Newrozê cihekî di nav heriyê de bû. Polîsan her tim erîş dikir. Piyê kê bi herî bûya, digotin wa ev jî pîrozbahiyê hatiye û ew digirtin binçavan.

(Metin, 39 salî, Kaynar-tepe)

Tişte ku herî zêde bîrê dikim ev e; li Parka Kôrhatê qadeke me ya Newrozê hebû. Pêşiyê ew der ax bû. Heta 94-95an her tim tîjî dibû. Paşê polîsan dida pey me. Em dîsa diçin, lê ne bi qasî Newrozên nava kolan bikêf e.

(Ferhat, 44 salî, Fatih)

Cenaze töreninde de olay

DIYARBAKIR (DHA)

Diyarbakir'da 3 gün süre ile PKK'ın açtığı birinci ulusal keşmeşkeş töreni, 7. gününde de devam ediyor. Tören, Diyarbakir'da 3 gün süre ile PKK'ın açtığı birinci ulusal keşmeşkeş töreni, 7. gününde de devam ediyor. Tören, Diyarbakir'da 3 gün süre ile PKK'ın açtığı birinci ulusal keşmeşkeş töreni, 7. gününde de devam ediyor.

Polisin evine saldırı

Diyarbakir'da 3 gün süre ile PKK'ın açtığı birinci ulusal keşmeşkeş töreni, 7. gününde de devam ediyor. Tören, Diyarbakir'da 3 gün süre ile PKK'ın açtığı birinci ulusal keşmeşkeş töreni, 7. gününde de devam ediyor.



Diğer törenlerde olduğu gibi bu süreçte de protestolar düzenlendi.



“Li cihê sersaxiyê meş”, *Diyarbakir Gün*, 07.12.2003; “Di cinazeyê de bûyer”, *Milliyet*, 31.03.2006.

bi piranî jî, ji aliyê dewleta tirk ve bi tundiyê ji cih û warên xwe hatî dîrxistin dest bi parvekirina warê bajarî kir û nasnameyeke netewî ya hevpar pêk anî. Kesên ku em pê re peyivîn hemû çalakiyên berxwedanê, cejnên wê hingê û rûdanên tundiyê û pevçûnên siyasî yên salên 1990 û 2000î bi bîr tînin. Her çend ku piştî pevçûnên 2015-2016an di deh salên dawî de her der aramtir jî be, Rezan îro jî cihê rûdanên bajêr e.

Tiştêkî ne rast e ku Rezan weke qadeke berxwedanê ya qehremanane were îdealîzekirin ne jî weke cihekî mexdûriyetê yê bêhêvî were pênasekirin. Bi vî çavî, lêkolîna me nîşan dide ku ji vê zêdetir, Rezan cihekî wisa ye ku mirov li hemberî şert û mercên zor û zehmet tê koşiyane, bi awayekî hevpar politîze bûne û xwe bi rêk xistine û tevî îmkânên kêmtir debarkirinê û fişar û tundiyêke zor û zêde ya dewletê karîne di nava bajêr de ji xwe re jîngehekê ava bikin.

“

Ez herriyê qet ji bîr nakim. Çend xaniyên mistakil hebûn û zêdetir xanî dihatin lêkirin. Me jî alîkariya wan dikir – Me kiremit dikişandin, tê bîra min. Wê demê, bi kepeçeyê nedikolan, lê hema wisa didanê... Niha [piştî erdhejê] hemû xanî xisar li wan ketiye. Birayê min di însaeta xaniyên taxê de bi qewale dixebitî. Me digot bila kar zû biqede û em perê xwe zû hildin, loma me hemûyan alîkariya wî dikir.

Ez jî çend salan li zeviya pembûyê ya nêzingî Îskanevlerî xebitîm.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

Me bar kir û em hatine maleke ku qet û qet tîrêjeke rojê jî jê nagire. Pêjgeh, serşok û tûwalet tev li odayekê bûn, em deh kes lê diman û kamkêşa wir nedihate gotin – lê bi awayekî em li wir dijiyan. [...] Birayê min hê jî li wir dijî.

(Ömer, 44 salî, Muradiye)

“Di nava heriyê de şerê nanê zik”, *Milliyet*, 16.01.1997.

Çamurda ekmek kavgası

Dagistan gıda yardımı almak isteyen kadrların, çarçuk içinde birbirlerini ezip, kavga etmeleri, içler acısı bir tablo oluyordu. Bâncısızca dağıtılan yardım seferinde kağıtların yığılması...

Muhammed TUBAN - DİYARBAKIR

DIYARBAKIRLI kadrların Kemer Çiftlik Polat'ın sokulması ile bir önceki yardım gıda parçaları arasında bulunan parçaları elden çıkararak dağıtım için bir araya gelmeleri, içler acısı bir tablo oluyordu. Bâncısızca dağıtılan yardım seferinde kağıtların yığılması, içler acısı bir tablo oluyordu. Bâncısızca dağıtılan yardım seferinde kağıtların yığılması...



Yardım parçalarını almak için birbirlerini ezmeye çalışan kadrların çarçuk içinde kağıtlar.

KAYAPINAR

Di salên 90î de ev qada fireh a
ku lê avahî nebûn cihê sereke bû
ji bo pirozbahiyên Newrozê berî
ku ev pirozbahî ber bi derveyî
bajêr ve werin veguhastin.



Balafirgeha leşkerî li
başûrojawayê Rezanê ye û
ji vir her roj balafirên şer
bi firê dîkevin û dadîkevin
û ev balafirgeh nahêle ev
dera bajêr bi hemdê xwe
berfirehtir bibe.

NEXŞEYA REZANÊ

1. Parka Koşuyoluyê
2. Cirtigeşa Hejmara 5an
3. Cadeya Sakaryayê
4. Dört Yol (Çarrê)
5. Xaniyên rezan
6. Otelên çivikan
7. Dêra Ortodoks a Suryaniyan
8. İstasyon û rêya trenê

Jêrerêya Koşuyoluyê jêrerêya sereke ye di navbera Rezan û semta Ofîsê ya Bajarê Nû de û ev rê bi piranî di xwepêşandanan de bi barîkatên polîsan tê girtin û ev jî dike ku pevçûn rû bide.

Suriçi (Nava Sûran) ya hawîrdora wê bi sûrên kevnar pêşandî di bin dorpêça artêşa tirk de hefta radeyeke zêde xisar lê çêbû û hat rûxandin. Ji wê hîjgê ve, desthilat li vê derê pêvajoyeke ji nû ve avakirinê ya gelekî nîqasbar bi rê ve dibe.

Taxên Lalebey û Alipaşayê di çarçoveya projeyê de veguherandina bajaran de bi destê TOKİyê hatin hilweşandin.



1. Parka Koşuyoluyê

Ev parka ku di sala 1995an de hatiye avakirin, yek ji parkên herî mezin ên Amedê ye û cihekî hezkirî yê niştcehên Rezanê ye. Di destpêkê de qadeke vala bû, lê piştî veguherandinê bû mekaneke hêşin a tîji kafe û dar. Her wiha, Park û Kolana Koşuyoluyê gelek caran ji bo xwepêşandan û çalakiyên siyasî yên girîng tê bikaranîn û vê taybetmendiya xwe balê dikişîne ser xwe.



2. Girtîgeha Hejmarê 5an

Ev girtîgeh di sala 1989an de çend meh berî derbeya 12ê Îlonê hat temamkirin. Serdema ku weke “Cihenema Amedê” tê zanîn, di wê de bi sedan girtî tûşî îşkenceyê bûn û bi dehan ji wan jiyana xwe ji dest da. Ev girtîgeh di sala 2022yan de hat valakirin û niha hikûmet dixwaze vê derê bike “navendeke çandê”.



3. Cadeya Sakaryayê

Ev cadeya peyayan taxa 5 Nisanê di nivî de dike du kerî û stûna bazirganiyê ya Rezanê ye. Ji ber mirovên ku ji gundan ji bo danûstandinê dihatin, ev der di salên 1980yî de weke rêyeke bazirganiyê ya zindî derdiket pêş û îro jî, hem niştcehên Rezanê hem jî kesên ji derve hatî hê jî berê xwe didin vê derê. Ev cade navendeke girîng a Rezanê ye ku taybetmendiya wê ya dînamîk û zindî tîne pêş çavan.



4. Dört Yol (Çarrê)

Ev rê gelek tê bikaranîn, herçiqasî ku navê “Çarrê”yê (Xaçerê) lê hatibe kirin jî, li vir şeş rê digihêjin hev û ev der navenda Rezanê ye. Karkerên ku bi heqdestê dixebitin, li vir li benda xwedîkaran in. Berî bajarbûna Rezanê, ev xaçerê jî dihat bikaranîn û rêyên Gundewar dihiştin hev. Li dor wê çayxane, xwarîgeh û dikan hene. Dört Yol (Çarrê) meydana girîng e ji bo civîn û xwepêşandanan.


5. Xaniyên rezan

Bi tene çend heb xaniyên gundan mane ji kevirê bazaltê yê reş çêkirî û ew xanî raboriya Rezanê tînin bîra mirov ku demekê serdanpê tijî rez bûye. Şaredariyê yek ji van xaniyan veguherandiye pirtûkxaneyê zarokan, lê belê wê gavê nayê xebitandin. Yekî din jî li ser Cadeya Qerecdaxê li pişt îstasyoneke benzînê veşartî maye.



6. Otelên çivikan

Ev cure avahiyên taybet ku weke “Otelên kevokan” tên zanîn avahiyên pirqatî ne ku çivîk li jûrên wê dimînin. Ev avahî li dora Cadeya Fatihê pir zêde ne ku ji xwe weke “Cadeya Çivîkbazan” jî tê zanîn. Ji kevokan bigirin heta bi papaganan gelek cureyên çivîkan li vir dimînin û xwediyên wan çivîkan wan ji gelek aliyên bajêr tînin vê derê.




7. Dêra Ortodoks a suryaniyan

Ev dêra dirokî û kevînar ku hewcedariya wê bi nûkirinê heye, li gundê Alîpînar e ku berê gundekî xirîstiyanan bûye û ev dêr hîna jî wê avasaziya xwe ya kêmqatî diparêze. Her çî qasî ku ev dêr weke dêreke ermenan tê nasîn jî, di eslê xwe de ji hêla cimeata suryaniyan ve hatiye avakirin. Li rex vê dêrê qonaxeke gundan heye ku li gorî mîmariya tradîsyonel hatiye lêkirin.



8. Îstasyon û rêya trenê

Îstasyon di sala 1935an de hatiye vekirin û di nav salan de ber bi rojhilatê ve hatiye dirêjkirin. Di salên 1950yî û 1960î de gelek mirov ji cihên gundewar bi trenê anîne bajêr. Îro ev rêya hesinî bûye sînorê ku Ofîs/Bajarê nû û Rezanê ji hev vediqetîne. Rezan di tapûyên fermî de hê jî weke “rezên îstasyonê” tê binavkirin.





3 Pir-rengî li taxê

Dîroka Rezanê ya dînamîk
û têkilhev tevneke civakî û
mekanî ya pir-tebeqeyî û
hevedudanî derxistiye holê.
Rezan, bi piranî, weke ciheki
“varoş” ê feqîr tê pênasekirin,
lê belê di eslê xwe de tevneke
wê ya pir-reng û pir-deng
heye û mazûvaniya kesên ji
paşxaneyên cuda cuda dike.

“Xaniyên berê yên Sûrê, prototîpên wan xaniyan in ku hewşeke wan a hundirîn heye û malbatan ev bi îmkânên xwe [Li Rezanê] eva kirine. Li hemû xaniyên bihewş bîreke avê (avkêşk) heye.

(Devran, 39 salî, Kaynar-tepe / Mevlana Halit)

Dem a ku me mala xwe bar kir û anî Mevlana Halitê [dora sala 1998an], gelek cihên li derdora Rêya Rihayê û Peyasê vala bûn. Înşaatên li wê derê û wê derê û lojmanên leşkerî hebûn [Li ser Rêya Rihayê, nêzikî Bûlwara Selahaddîn Eyyûbî], Hûzûrevlerî ku nêzikî gundê Peyasê û palûkeyan hatibû lêkirin, ew jî xwe jî berê de hebû.

(Devran, 39 salî, Kaynar-tepe / Mevlana Halit)



“Li Diyarbekirê ji sedî 33yê xelkê li koxikên bêdestûr de dijî”, *Sesin*, 28.12.1974; “Parîsa Rojhilatî, Diyarbekir, bi her awayî bajarekî ne birêkûpêk e”, *Yeni Yurt*, 07.10.1993.

Li tevna bajarî ya Rezanê, rêçên koçberiyên demên cuda
cudaya, bêwarbûnên bi zorê û politikayên jev cuda yên
rêveberiyên xwecihî hene. Bi têkiliyên xwe yên dirokî û
peywendiyên xwe yên mekanî, Rezanê ji berê de teşe daye
nasnameya Amedê. Li gorî gotina nûnerêkî/e Jûra Mîmaran,
“%90ê Rezana Kevn ji xaniyên bêdestûr pêk tê. Di salên
1960î de dema ku Bajarê Nû (Yenişehir) bi temamî bû bajar,
ev avahî weke kokikên bêdestûr hatin danîn û mirov li nav
rêzen li pişt îstasyona trenê bi cih bûn. Bi taxên xwe yên
wekî Kaynartepe, Muradiye û Fatihê, ku nêzingî navenda
bajêr in, bi kolanên xwe yên teng û avasaziyeke bajarî ya pir-
tebeqeyî û di nav demekê de pêk hatî, ku ji pêncî salî zêdetir
e; beşa kevn a Rezanê her çend ku ji Sûrê bi tevahî qut were
hesabê jî, di navbera wan her duyan de peywendiyên dirokî û
mekanî hene. Tevna berfireh a kokikên bêdestûr ên li Rezanê
vedigere ser rezên berê û xaniyên nav rezaan ên niştecihên
nava Sûrê. Her wiha, bandora îstasyona trenê ya di pêşketina
Rezanê de jî girêdayî cihê Deriyê Rihayê (Urfakapı) ye.”²⁸

Di salên 1990î de her ku serjimara niştecihên Amedê
zêdetir dibe, avahiyên kêmbûnê pir zû tînin avakirin da ku
kesên bêwarbûyî bînin starkerin. Li gorî gotina avahîsazekî,
ku berê serokatiya Daîreyê Îmarê ya DBByê jî kiriye, di
salên 1990î de li herêma Rezanê avasaziyeke bêdestûr û ji
xizmeta endezyariyê bêpar berbelav dibe. Pêdiviya starbûna

28. Mehmet Atlı,
Hepsi Diyarbakır
(Stenbol: Weşanên
İletişim, 2014), 27.



“Ma Diyarbekira Me Dê
Biketa Vî Halî!...”, *Yeni
Yurt*, 08.02.1993; “Jî Jûra
Avahîsazî û Mîmaran
Gazind û Rexneyên Tund li
Şaredariya Bajarê Mezin”,
Yeni Yurt, 13.07.1993.



Li dora salên 1990, 1995an...
Avahî pir bi lez çêdibûn û berbelav
dibûn. Ew hemû xîrecir û guregura
înşaetan tê bîra min.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

Mirovên nû dihatin. Te ji cil û
bergên wan tê derdixist, ji wir kifş
bû. Wexta ku dihatin, bi çanda xwe
dihatin: Dêrikî cuda, Çinarî cuda
dihatin xuyanê. Dema ku mirovan
gundê xwe li pey xwe dihişt û
dihatin, jiyana wan nediguherî.
Çawa ji gundê xwe hatibin, jiyana
xwe wisa berdewam dikirin. Paşê,
ciwan guherîn, lê yên navsere
neguherîn...

(Metin, 39 salî, Kaynartepe)

bi lezgînî ya xelkê nûhatî ev cihên bi avahiyên kêma-kalîte
û koxikên bêdestûr zêdetir û firehtir kirine. Avahîsaziya
bidestûr û biplan pir kêma û sînorkirî ye, hema hema tu
avahî li gorî planên îmarê nayên avakirin.²⁹ Avahîsazekî ku
bi giranî di salên 2000î de li herêma Rezanê û Bajarê Nû
projeyên xaniyan çêdike, dibêje ku ew projeyên xwe wisa
çêdikin ku mirov bikarin pêdiviyên xwe yê bingehîn dabîn
bikin. Piraniya van projeyên sêwirandî di asta plansaziyê de
dimînin û ji bo rûberê van xaniyan tu sêwirandineke zêdetir
nayê kirin.³⁰

Li cihên koxikên bêdestûr û xeyrîresmî yê navenda dîrokî
ya Rezanê, avahiyên heyî bi awayekî tîk hatin lêkirin û
hin malên kevn hatin xirabkirin da ku miteahîten xwedan
kargêhen biçûk bikarin, li şûna wan malan, blokên
apartmanên pir-qatî ava bikin. Li herêmên wekî taxa 5
Nisanê, Mevlana Halit û Şeyh Şamil, li ser erdên berê
plannekirî, bi yek-şeweyî blokên apartmanan hatin çêkirin.
Gundê kevn ê Alipınarê ji ber ku nêzikî balafirgehê ye,
bilindahiya avahiyan (hejmara qatan) sînorkirî ye û ji ber
vê jî, vî gundî hê jî karakterê xwe yê avahiyên kêma-qatî ji
dest nedaye. Her dîsa, hin cihên Rezanê ji bo niştecihên çîna
navîn bi awayekî plankirî li bajêr hatine zêdekirin û kargêhen
fermî yê ji aliyê dewletê ve lêkirî û projeyên avasaziyê yê
kooperatîfan jî di vê çarçoveyê de ne.

Li gorî berpirsekî ku di navbera salên 1999-2004an de li
Şaredariya Peyasê xebitiye, tevî hewildanên ji bo ku berê
faaliyetên avahîsaziyê yê miteahîdan bidin Rezanê, eleqeya
ji bo avahîsaziya derveyî Peyasê bi sînora bûye.³¹ Berpirsekî/ê
di heman serdemê de li Şaredariya Rezanê xebitî jî dibêje, di
serdema behskirî de li navçeyê wergirtina destûrê pir zehmet

29. Veda Seven
Biçen, "1960'lerden
Günümüze Çok Katlı
Konut/Konutlaşma
Süreci Diyarbakır
Kenti" (Teza
Doktorayê, Zanîngeha
Teknik a Karadenizê,
2020), 179.

30. Biçen, 188.

31. Biçen, 175.



Dema ku ez nû hatim, her kesî ji min re digot “Pîi, keçika Zazayan!” Min bi tenê bi zazakî dizanî. Piştî ku min dibistan qedand, ez hînî tirkî bûm. Ez ji derdora xwe hînî kurdî bûm. Ji ber ku heta pola 5an min nikaribû ez hînî tirkî bibim, ez neşiyam bi mamosteyan re têkilî dayînim. Derdoreke min nebû. Ez jî bi hevalên xwe yên polê yên zazakîzan re dipeyivîm. Paşê hevalên me çêbûn. Piştî ku em hînî tirkî jî bûn, em êdî ketin nava koma hevalan.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

Nezanîna ziman zehmet bû. Wexta ku min dest bi dibistanê kir, min qet bi tirkî nizanibû; hejarî û pevçûnan zorê dida me. Pevçûn pir zêde û cidî bûn.

(Metin, 39 salî, Kaynartepe)

Wê demê, kesên ku nedixwestin ji Kurdistanê derkevin, dihatin Rezanê.

(Devran, 39 salî, Kaynartepe /
Mevlana Halit)

bû û pîrbûna koxikên bêdestûr pîrsgirêkeke mezin bû. Her çî qasî ku şaredariyê li Rezana Kevn hin tawîz dabîn jî, li cihên nû li dijî avahîsaziya bêdestûr paşve gav neavêt û piştî hilweşandina zêdetirî pêncî avahiyan bi gefên mafyaya erd û ereziyan re rû bi rû ma û li hemberî vê bertekên cidî hatin. Tiştê balkêş ew bû ku sektora taybet û kooperatîf di însaetan de zêdetir derdiketin pêş, lê firmayên însaetê yên pîr mezin û kevn kêmtir bûn; binê vê yekê hat xêzkirin ku demekê hosteyên hesingirêdanê yên însaetan jî miteahidiyê dikirin.³² Lê belê, hem pîrsgirêkên avahîsaziya bêdestûr û pîrbûna koxikên bêdestûr ava kirî, hem jî zalbûna miteahîdên bêtêcrûbe li qada avasaziyê, bûn bingeş ji bo derketina tevna bajêrî ya tevlîhev a vê navçeyê. Di encama vê de, peyzaja bajarî ya Rezanê dîmeneke ji yek-şeweyîbûnê dûr derdixê holê ku qonaxên cuda cuda yên avahîsaziya bêpergal a bajarî dinimîne.

Tevna civakî ya Rezanê jî, ji ya ku tê behskirin gelekî tevlîhevtir û kompleksir e. Herêma çî ji aliyê etnîkî ve û çî ji aliyê meyildariya siyasî ve be, gelekî pîr-reng e. Di demên pevçûnên herî giran de, mirovên ji parêzgehên kurdan koçber bûyî û hatî Rezanê bi cih bûyî bi xwe re mikro-kosmoseke ji çandên xwecihî pêk anîne. Yên nûhatî, bi giştî, bi rêya têkiliyên xwe yên civakî hatine û bi cih bûne û vê yekê jî wisa kiriyê ku lihevgrîtinê komên civakî yên herêma zêdetir derkevin meydane; bo nimûne, Zaza li derdora Caddeya Kedê (Emek Caddesi) û Mêrdînî li nêzîkî Caddeya Girneyê bi cî bûne. Her wiha, li vê derê eşîra Koredereyê ya ji Licê jî balê dikişîne ku piştî ku di salên 1990î de hevkarîya hikumetê qebûl nakin, tîn û li vir bi cî dibin. Ji ber ku Rezan mirovên



Di dema Baydemîr de taxa me
pir paqij bû. Dema ku ez diçûm
zanîngehê, dihatin û ji me dipirsîn:
– pêdiviya we bi çi heye? Paşê
dihatin û derhal û rasterast pêk
dianîn. Digotin “Em amade ne ku
xizmetê ji we re bikin”. Ew serdem
pir baş bû.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

Ew çax xweştir bû, tiryak tune bû
[2007-2008]. Aborî baştir bû. Piştî
2014an, bi zêdebûna bêkariyê re
kişandina tiryakê jî zêdetir bû. Di
nav 15 salan de li Rezanê tiştekî
nû nehate kirin. Heke tiştek hebe
ku Rezanê li ser pêyan bigire, ew jî
Cadeya Sakaryayê, Nexweşxaneyê
Rezanê û Postexane ye.

(Baran, 25 salî, Fatih)

Ji her aliyê Bakur re mazûvaniyê dike, ku ev parçe parçeyê
bakur ê Kurdistanê di nav sînorên Tirkîyeyê de ye, ev der
bûye zeminek ji bo avakirina hişmendiyê neteweyî û siyasî
ya hevpar.

Rezan, bi pir-rengiya di tevna xwe ya civakî de, ne bi
tenê jîngehek bûye, di heman demê de bûye cihekî girîng
ê dînamîzm û çalakbûna siyasî û çandî ya Amedê jî. Vê
pir-rengiya civakî û mekanî roleke diyarker jî lîstîye li
ser polîtîkayên bajarsaziyê yê rêveberiyên xwecihî. Di
salên 2004-2014an de, ku wê demê Osman Baydemir
serokşaredarê DBByê bû, xebat diyar dikin ku hewil hatiye
dayîn ku nêzîkatîyên li vê tevna kompleks bi awayekî tevlêker
û hembêzker bin. Yek ji aliyên balkêş ên vê serdemê ew e ku
hêşinahî tê zêdekirin û şaredarvaniyê ku li ser hawirdorê
hesas e, tê meşandin. Lê belê çavkaniyên sînorkirî yê aborî
û pirsgrêkên bi rêveberiya navendî re bûne asteng li ber hin
projeyan.

Di sala 2011an de, piştî şer û pevçûnên li Sûriyê û Iraqê,
Rezan êdî mîvandariya penaberên ji welatên cîran dike ku
bi erebî û kurdî qise dikin. Yê ji Kobanî û Şingalê jî tê de,
hin penaber li gel tevgera kurd xwedan peywendiyên siyasî
yê hevpar in bi niştecîhan re. Neseqamgîriya li herêmê rê
daye wê yekê ku Dom jî ji welatên cîran koçber bibin û bîne
Rezanê. Li gorî axaftinên cur bi cur ên bi hevpeyvîneran re,
piraniya van penaberên çendek berî niha hatî li herêmên
Rezanê yê kevn ên bi avahiyên xirabtir bi cih bûne. Rezan
weke keleha tevgera kurd tê dîtin, lê belê, hêmanên siyasî
û civakî yê cur bi cur jî tê de hene. Di salên 1990an de li
herêminên Şeyh Şamil, Kaynartepe û Fatihê pareke girîng
a îslamparêzan jî hebû; alîgirên Hîzbûllahê li dora hin
mizgeftan xwe bi rêxistin dikirin û li Rezanê malên hucreyê
ava dikirin.

“Operasyona ‘Balдар’”,
Milliyet, 10.07.2001.



Hin kes ji Sûrê, hin kes ji
Sûriyeyê hatine. Niştecihên
wê yên xwecihî nehatin, mala
xwe bar kirin. Çûn Peyasê,
Rezvanê (Bağcılar).

(Galip, 69 salî, Fatih)


Hîzbûllah zêde bû. Birayê
hevalê min ji ber ku ji wan
qetiyabû, li ber çavê min hat
kuştin, tê bîra min.

(Metin, 39 salî, Kaynaratepe)



Rezanê, ev ji pêncî salî zêdetir e ku qonaxên avasazî û geşepêdanê yên cuda cuda û tipolojiyên bajarbûnê yên cihêreng di nava xwe de xwedan kirine û mazûvaniya gelek komên civakî yên hev cuda kiriye. Wekî ku hin kêsên me pê re hevpeyvîn çêkirî jî çavdêrî kirine, mirov dikare bibêje ku guhartinên bajarî yên van salên dawî, yên ku pîvanga wan mezintir bûye, kiriye ku Rezanê nisbet bi herêmên din xirabtir bibe. Tevî vê jî, divê bête naskirin ku beşeke girîng a niştecihên Amedê heta roja îro di Rezanê re derbas bûye û teşe daye karakterê Rezanê yê dînamîk û guherbar.





4 Weke mekaneke starbûnê, qadeke buhurînê

**Ji roja ku ava bûye û pê ve,
Rezan her tim bûye cihê
starbûna hin beşên civakî yê
herî bêparastin û bêderfet.
Tevna wê ya demografîk a
ku bi guherîna bêdawî ya
niştecihên wê teşe digire û
ji ber vê jî, her tim diguhere,
Rezan, ji bo kesên kêr-derfet
ên nûhatî, li bajêr rola xwe ya
'xaleke girîng a xwelêgirtinê'
hîna jî bi cî tîne.**

milyarekî", *Milliyet* , 15.04.1985.

57

“Pêşmergeyan zirareke bi milyonan da”, *Yeni Yurt*, 12.02.1993; “Di avahiyeke de 40 kes”, *Yeni Yurt*, 26.04.1993.

“ Tê bîra min, dema ku em zarok bûn, li Amedê pêşmerge hebûn. Bi cil û bergên xwe filan digeriyan. Yê me li binê avahiyan amadekarî dikirin, ji ber ku digotin dibe ku [Sedam] êrîş bike. Li wir xwarin didan ser hev, betanî filan lê hebûn. Digotin, eger êrîşeke kîmyewî were kirin, divê em rûyê xwe bi betaniyên şil bigirin filan bêvan. Ev rewş çend mehan wiha çû.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamîl)

Her kesî wisa bawer dikir ku – dê ji hewayê madeyên kîmyewî biavêjin. Xelkê, di bin avahiyan de naylon vedişartin. Jinekê av bi ser me de dikir. Ji bo ku pencereyên xwe kîp bikin, mirovan ew qasî zêde bandên ambalajê standibûn ku êdî ji wan re digotin banda Sedam.

(Metin, 39 salî, Kaynartepe)

Li hemberî êrîşê kîmyewî nalyon dihatin xebitandin. Me av dikir nav naylonan.

(Ferhat, 44 salî, Fatih)





Pêdiviya me bi alîkariyê hebû. Kesên ku piştî me hatibûn, bi îhtîmaleke zêde mercên wan ji yên me baştir bûn. Em ne di wê rewşê de bûn ku alîkariya hinekên din bikin. Pêdiviya me bi xwe bi alîkariyê hebû. Em bi xwe biyanî bûn. Ew kesên din – yên ji Licê, Hazroyê – peywendiyên wan hebûn, ew bi awayekî hev girtî û rêxistin kirî dihatin.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

Ev der erzan bû, perê me tune bû. Em bi hev re bi kamyonan hatin. Hinek ji wan çûn semta Ofisê, hinek jî çûn Şehitlikê. Yên ku perên wan tune bûn dihatin vê derê.

(Ömer, 44 salî, Muradiye)

Le belê, kesên ku tên Rezanê, bi awayekî mayinde lê bi cî nabin, wexta ku rewşa wan baştir dibe – ev bi salan jî bidome – diçin dereke din. Gotina vî tiştî bi hejmaran zehmet be jî, piraniya kesên ku di salên 1980yî û 1990î de li Rezanê bi cî dibin, ji salên 1990î û pê ve çûne herêmên din ên bajêr, bi taybetî jî taxên bi lez ava bûyî yên Rezana Nû û Peyasê. Barkirina berdewam a niştecihan ji bo kesên nû cih vedike ku di rewşên bêhtir neewle de dijîn. Mirov dikare eleqeya vê taybetmendîya Rezanê bi têgiha “hejariya bi dorê” saz bike û rave bike, ku komên bidezavantaj ên li deverekê bi demê re wexta ku rewşa wan baştir dibe, derbasî cihên din dibin, lê komên nû yên ku tên şûna wan heman zehmetiyên dikişînin.³⁴ Li Rezanê jî çerxeke bi vî rengî heye; dema niştecihên kevn bar dikin, yên nû hatî hewil didin ku jiyanekê li gorî derfetên xwe li vê deverê ava bikin. Heta niha Rezanê ji bo komên bidezavantaj weke qadeke xwegihandinê, jiyanekê li gorî derfetan û niştecihbûna demkî xizmet daye. Tevî guhartinên ku di salên dawî de di profîla niştecihan de çêbûne jî, Rezan îro jî ji bo komên civakî yên herî marjînal kirî yên bajêr rola xwe ya cihê niştecihbûneke guncav didomîne.

Rezan di demên dawî de bûye navnîşana nû ya penaberên ji Sûriye û Iraqê, û her wiha piştî pevçûnên çekdarî yên 2015an ên Sûrê, ev der bûye cihê wan kesên ku li nav Amedê bi zorê ji cih û warên xwe hatine derxistin. Van pevçûnan bandoreke mezin li ser çand û dîroka herêmê kir û gelek kes ji cih û warên xwe hatin derxistin. Piştî pevçûnan, dewletê dest danî ser milk û malên Sûrê û projeyên veguherandina bajarî pêk anîn. Di encama vê pêvajoyê de xelkê herêmê neçar hat hiştin û hejarî girantir bû. Gelek kesên ku mal û milkên

34. Oğuz Işık û M. Melih Pınarcıoğlu, *Nöbetleşe Yoksulluk Sultanbeyli Örneği* (Stenbol: Weşanên İletişim, 2001).



Li kolana me postevan, mamoste
û parêzer dijiyan. Rezan ji bo her
kesî cihê jiyanê bû. Di nav salan de
kesên ku rewşa wan a çînî baştir
bû, çûn. Niha bi tenê kesên wisa lê
hene ku tiştekî wan tune ye...

(Metin, 39 salî, Kaynartepe)

Di 1994an de ez 9 salî bûm. Ez
diçûm Dibistana Seretayî ya
Herême ya Şevînî (YİBO), min
li wir dixwend. Em bi meşê ji
Licê diçûn Qulpê. Dema ku em
digihîştin Qulpê, êdî li wir mal
tune bû, agir bi her derî ketibû.
Şer hebû, JÎTEM li herême
bû. Wê şevê em li mala xaltiya
min man. Paşê em vegeriyan

dibistanê. Piştîre bi otobusê em
hatin Amedê. Otobusê em li Derê
Çiyê peya kirin. Me nedizani ka
em ê çi bikin û em bi saetan li ser
bankekê rûniştin. Paşê bi tesadufî
gundiyeke me di ber me re derbas
bû. Ji me re got, nîv saetî li benda
min bimînin, ez ê herim PTTyê û
telefonekê vekim. Piştîre em hildan
û birin Rezanê. Em bi peyati çûn.
Tê bîra min, em di ber Ofîsê re
derbas bûn, wê demê çarşiya
bînerdî dihat avakirin... Em ji
Rêya Trenê derbas bûn û ketin
kolana 231emîn. Ez ê tu caran ji
bîr nekim!

(Devran, 39 salî, Kaynartepe /
Mevlana Halit)

xwe, derfetên debarkirinê ji dest dan, neçar man ku koçberî
Rezanê bibin. Hebûna xaniyên bi bihayên guncav, derfeta
karên bêqeyd û cihê wê yê navendî, hin ji sedemên sereke
bûn ku komên kêmdahat ber bi Rezanê ve dikişandin. Bi vî
awayî, Rezan bû herêmek ku hem penaberên ji Sûriye û Iraqê
hem ji niştecihên ku bi zorê ji Sûrê hatine derxistin lê bi cih
bûne.

Ev guhartin tê wê wateyê ku, kesên ji çîna navîn ku niha li
taxên nû yên dûrî navenda bajêr dijîn jî di nav de, bi awayekî,
rêya gelek kesî di Rezanê re derbas bûye. Niştecihên kevn bi
gelemperî bi rêya xwedîtiya milkan, kargehan an jî têkiliyên
civakî têkiliyên xwe yên bi vê herême re didomînin. Di
vir de mirov dikare bibêje ku rola Rezanê ya di pêşketina
bajarvaniya Amedê de ji sînoren herême wêdetir e. Rezan ne
tenê ji hêla erdnigariyê ve li navenda vê metropolê ye ku her
ku diçe dorfirehtir dibe, her wisa jî, yek ji qadên sereke ye
ku kesên nû hatî weke niştecihên Amedê dest bi jiyana bajêr
dikin.



5 Paşguhkirin, demxekirin û valakirin

Rezan navçeyê Amedê ya navendî û bi serjimareke zêde ye, lê belê her tim hatiye paşguhkirin, kesî bala xwe nedayê û taybetiyên xirab lê hatine barkirin û bi van hatiye demxekirin. Ev çarçoveya nihêrîn û pênasekirinê dê pêşiya projeyên bergeh-mezin ên veguherandina bajarî veke û ev proje jî tevna civakî û mekanî ya Rezanê ya zengîn û pir-tebeqeyî tune dikin û dibin sedema dûrxistina beşeke girîng a niştecihên wê.

Lêkolînên ku navenda wan Rezan e, di wan de nîrxandinên neyînî derdikevin pêş. Ev lêkolîn yan bi qasî ku hewce ye, behs ji wê yekê nakin ku avahîsaziya vê dera bajêr li ser bîngeha tundiya dewletê pêk hatiye, yan jî bi awayekî ku ewlehîyê dikin navend li meseleyê dinîhêrin.³⁵ Ev navçeya ku bi koçberbûna bi zorê ya ji gundên kurdan ber bi bajêr ve hatiye halê xwe yê îroyîn, pêvajoya wê buhurandî, weke “bajarvaniya çexlexwarî” yan “bajarvaniya sexte”³⁶ tê binavkirin. Di çapemeniya cihkî de Amed “bajarê transît”³⁷ û “gundebajar”³⁸ tê binavkirin û dîsa tê gotin ku li Amedê “bajarvaniyeke netendurist”³⁹ çêbûye û ew bi awayekî “hormonkirî”⁴⁰ mezin bûye. Bajare ku koçberkirinên bi zorê herî zêde bandor lê kiriye weke “mega-gund”⁴¹ û “bajarê termînal”⁴² tê pênasekirin. Ji bo tekezkirina cudahiya di nav niştecihên bajêr de jî, gotina “bajarên cuda di hundirê heman bajarî de”⁴³ hatiye bikaranîn.

Mirov dikare bibêje ku rêveberiyên xwecihî jî xwedan nêzîkatiyeke hema hema heman şeweyî ne ku ev rêveberî yek ji akterên herî girîng ên bajêr e. Cabbar Leygara ku di navbera salên 1999-2004an de Serokatiya Şaredariya Rezanê kiriye girîngiyeke taybet dide bajarvaniyê û dibêje ku bajar ji bo koçberiya di salên 90î de amade nebûye û ji ber gelek sedeman, bi taybetî jî kêmasiya xizmetguzariya bîngehîn û jîdestdayîna nîrxên bi koçberiyê destpêkirî, ev der weke gundekî qerase ye di dirûvê bajarekî de.⁴⁴ Ev kes dema ku ji gundên xwe hatin, wan nîrxên xwe jî dest dan, lê adetên xwe yên berê berdewam kirin, li qatên jorîn ên apartmanên mezin tendûr çêkirin û li dora tendûrê gom çêkirin û vê profîla Rezanê çêkirin.

Hin şîrove tu carî behs ji wê yekê nakin ku niştecihên Rezanê di bin zor û zextê de ji cih û warên xwe hatine dûrxistin û vê jî bi xwe re encaminên neyînî anîne; di şîroveyên wisa de koçberî û penaberî bi xwe weke pîrsgirêkê tê nîşandan. Ji bo xurtkirin û edilandina vê nihêrinê ramanên pîrsporan tên



Me wisa nedikir, lê cîranên me dikirin. Li hewşa li pêş mala me çêlek, mirîşk xwedî dikirin. Pîrsgirêka ardûyê hebû. Mirovan li ser banan nan dipehtin. Li ser banên gelek avahiyan tendûr hebûn.

(Hasret, 42 salî, Şeyh Şamil)

35. Tahire Erman, “Urbanization and urbanism”, *The Routledge handbook of modern Turkey* (Routledge, 2013), 298.

36. Dündar Dağlı û Ayşe Çağhyan, “Determination of urban sprawl and transformation process: The case of Diyarbakır”, *International Journal of Geography and Geography Education* (IGGE), Hejmar/Cild 43, (2021): 218.

37. “Gelek malbatên ku li taxên peravî û li koxikên bêdestûr dijîn, zehmetiyê dikişînin”, *Yeni Zaman*, 27.02.1976

38. “Ma Diyarbekira Me Dê Biketa Vî Halî!...”, *Yeni Yurt*, 08.02.1993.

39. “Niha jî zehmetiya vegeerê”, *Milliyet*, 28.07.1995.

40. Mazhar Bağlı û Abdulkadir Binici, *Kentleşme Tarihi ve Diyarbakır Kentsel Gelişimi* (Enqere: Weşanên Bilimadamı, 2005), 167.

41. Bağlı û Binici, 10.

42. İnan Keser, *Göç ve Zor: Diyarbakır Örneğinde Göç ve Zorunlu Göç* (Enqere: Weşanên Ütopya, 2011).

43. Ahmet Özer, “Göç ve Kentleşme Kısacasında Bir Kent: Diyarbakır”, *Tüm Yönleriyle Diyarbakır 2. Sempozyumu* (Enqere: Efil, 2011), 271-288.

awayekî fermî Kaynartepe weke “Cihê Veguherandina Bajari” ragihandiye û li gorî planên îmarê, hatiye plankirin ku proje li nêzikî Dörtölê (Çarrê) dest pê bike ku navenda Rezanê ye û di demên serhildanan de pir caran bûye binkeya sereke. Bi taybetî, pêvajoya bêwarkirina bi zorê ya ku di demeke nêzîk de li Sûrê pêk hat, wê yekê tîne bîra mirov ku siberojê pêkan e ku heman gef derkeve pêşberî gelê Rezanê jî.

Ji nû ve avakirina Rezanê ne gaveke hêsan e. Tevna tevlihev a xwedantiya milkan wê yekê hewce dike ku bi pişkdaran re demeke dirêj danûstandin bêne kirin. Her wiha, ji ber nêzîkbûna balafirgehê, li Rezanê bilindahiya avahiyan bi heşt qatan hatiye sînordarkirin û ev jî derfetên spekulasyona xanî û milkan bi sînor dike. Ji ber vê yekê, veguherandina bajari ya li Rezanê zêde derfetê nade ku kardariyeke baş were bidestxistin û jê re veberhênanekê girîng a dewletê hewce dike. Her wiha, dema ku mirov zêdebûna hejmara niştecihên Rezanê dide ber çavan, li gorî texmînên çavkaniyên DBByê dibe ku cihguhartinê nêzî %40ê niştecihên herêmê pêwîst bike ji bo ji nû ve avakirina wê li gorî standardên îroyin ên avahîsaziyê. Texmîn dibêjin ku li Kaynartepeyê bi hilweşandina avahiyên li qada projeyê, dê ji nav 6 hezar û 750 kesên 5 hezar kes neçar bimînin ku ji malên xwe derkevin. Li gorî gotina Hevserokê Şaxa Amedê ya Jûra Plansazên Bajêr Çekdar Taşkıran, di raporê de hatiye pêşbînîkirin ku serjimara herêmê dê bi demê re kêm bibe û avahiyên nû jî tenê ji bo bicihkirina 1.750 kesên hatine plankirin.⁴⁸ Li gorî wê planê, wisa hatiye hesibandin ku nêzî 5 hezar kes jî dê ji herêmê koçber bibin. Ev rewş hem tevna civakî hem jî mafê starbûnê bi awayekî cidî tehdît dike.

48. “Li Kaynartepeyê bi navê veguherandina bajari plana têkşikandinê”, *Politika Haber*, 01.05.2021.



Piştî erdhejê êdî tu avahî qayîm û pihêt nîn in. Mirov lê dimînin ji ber ku çareyeke wan a din tune ye.

(Metin, 39 salî, Kaynartepe)

Zemîna wê saxlem bû, lewma tiştek pê nehat. Min digot ev der dê li erdê rast bibe. Min got “Rezan êdî çû”. Bi tenê 3-4 tene xaliçe ketine erdê, ew qas.

(Galip, 69 salî, Fatih)

Bandor lê nekir. Erdhej saet di 04.17an de bû, di 05.30an de hatim Rezanê. Min digot niha bi erdê ve bûye yek. Bi ihtimaleke zêde, kereste û melzemeyên avahiyên kevn bikalîtetir û hîmên wan saxlemtir bûne ku zêde zirar lê çênebû.

(Baran, 25 salî, Fatih)

Nerazîbûn û îtirazên hiqûqî jî tê de, saziyên civaka sîvîl li dijî vê projeyê derketin û proje hate rawestandin. Lê belê bandora wê hê jî teşe dide herêma. Stratejiyeke rizandinê li Rezanê, bi taybetî jî li Kaynartepeyê, tê meşandin da ku vê veguherandina bajarî rewa nîşan bide. Kes bi piranî dest nade kiryarên neyasayî û avahiyên valakirî wisa çênakirî û di rewşeke xirab de tîn hîştin. Ev rizîn bi erdhejên 2023yan hê jî kûrtir û girantir bûye ku li Rezanê ziyaneke mezin gihandibû bi hezaran avahiyên. Ji bo pêşîlêvekirina projeyên veguherandina bajarî ev êdî bûye manevrayeke stratejîk di plansaziya bajarî de ku ew navçe her ku biçe bibe cihêkî wêran û xirab ji bo jiyane.

Erdhej, li Rezanê, bi taybetî li herêma ku avahiyên kevn û lawaz lê hene, bûye sedema zirarên giran û pêdiviyên herêma hê zêdetir anîne ber çavan. Careke din derketiye holê ku avahîsaziya bajarî ya ji kolanên teng û avahiyên bêdestûr pêk hatî di erdhejekê de ji bo saxfilîtîna rîskeke mezin dihevine. Li gorî nirxandîna sala 2012an a Necatî Pirinçioğlu, ku serokê berê yê Şaxa Amedê ya Jûra Avahîsazan û hevserokê berê yê Şaredariya Peyasê bû, avahiyên di ber hev de û bê plan çêkirî di dema felaketê de ji ber zehmetbûna xwegihandinê û bêîmkanbûna midaxeleyê li herêma metirsiyeke mezin derdixin holê. Hem jî bo parastina ewlehiya canê mirovan hem jî ji bo xurtkirina bingeha civakî, pêdiviyeke krîtîk heye ku ev avahî bi veguherandina

Mahkeme kentsel dönüşüme 'dur' dedi

Diyarbakır 3'üncü İdare Mahkemesi, Kaynartepe Mahallesi'nde belediyenin hayata geçirmek istediği kentsel dönüşüm projesini "kanuna aykırı" bularak iptal etti.

Güncel

Görüş: 31.01.2023 06:30

Güncelleme: 31.01.2023 06:30



Fotoğraf: MA

“Ji bo veguherandina bajarî, “raweste”, dibêje dadgeh”, *BirGün*, 31.01.2023.

di cihê cih de werin nûkirin.⁴⁹ Di gel vê, li Rezanê zirareke gelek kêmtir çêbûye ji ya ku dihat payîn. Lê belê, pêvajoya veguherandinê lazim e ku bi beşdarkirina xelkê bête plankirin û tê de endîşeyên niştecihan ên wekî bêwarmayînê û parastina tevna civakî werin hesibandin.

Îhtîmala veguherandina bajarî li Rezanê hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê civakî ve îşaret bi guherîneke girîng û mayinde dike. Paşguhkirina herêmê ya bi salan, koçberiya zêde û pêvajoyên bajarvaniya çalexwarî hin pîrsgirêk derxistine holê û ev pîrsgirêk di van demên dawî de bi erdhej û afetên din re hê zêdetir xuya bûne. Di gel vê yekê, bi projeyên veguherandinê re, midaxeleyên stratejîk ên dewletê û nêzîkatîyên sermaye-navendî yên li dora vê meseleya veguherandinê, ji aliyê parastina tevna civakî ve û ji aliyê peydakirina çareseriyêke dadmend ve, pîrsên cidî derdixin holê. Bi taybetî taxên wekî Kaynartepeyê bûne armanca projeyên veguherandinê ku stokeke avahiyên kevn û di ber hev de çêkirî lê heye. Lê belê, tevna xwedantiya milkan a tevlihev û kompleks û pê re jî, serjimara zêde ya herêmê pêvajoya veguherandinê hem ji aliyê huqûqî ve hem jî ji aliyê civakî ve dijwar dike.

Pêvajoya veguherandina bajarî ya li Rezanê dê ne tenê bandorê li avahiyên fizîkî bike, ew ê her wiha bandorê li têkiliyên civakî, çavkaniyên aborî û şewaza jiyana niştecihên wê jî bike. Ji ber vê yekê, veguherandina bajarî lazim e ku ne tenê weke midaxeleyêke endeziyariyê were dîtin ku armanca wê kêmkirina rîskên afetan e. Tê pêşbînîkirin ku %40ê niştecihên vê herêmê dibe ku neçar bimînin ku jê bar bikin û ev, di gel endîşe û tîrsa bêwarbûnê, dike ku bandorên vê veguherandinê krîtîktir bibin.

Di vê çarçoveyê de tiştekî girîng e ku siberoja Rezanê li gorî daxwazên rêveberiyên xwecihî, hikumeta navendî û niştecihên herêmê were avakirin. Dema ku veguherandina li cihê xwe bi nihêrîneke wisa were plankirin ku tevna civakî û aborî ya herêmê dihesibîne û bi beşdarkirina niştecihan bi rê ve diçe, hingê hem li dijî erdhejan avahiyên pihêrî dikarin werin avakirin hem jî pêdiviyên niştecihan tîr bersivandin. Lê belê di vê pêvajoyê de lazim e ku projeyên bi wê cureyê neyên kirin ku dê paşguhkirina herêmê ya ji berê de û pîrsgirêkên heylî zêdetir û girantir bikin; hewce ye ku Rezan ne weke qadeke ji nû ve avakirî, lê weke parçeyêke zindî ya bajêr were dîtin.

49. Öztürk, "Socio-Spatial Practices of the Pro-Kurdish Municipalities: The Case of Diyarbakır", 303.



Encam

Krîfîk e ku dîroka bajarbûna bi zorê
û bandorên wê yên îroyîn werin
lêkolînkirin, ji ber ku ev hem dihêle
ku mirov rabirdûyê fam bike hem jî
destûrê dide mirov ku ji bo siberojê
di avakirina polîtîkayên bajarvaniyê
yên dadmendtir û hewînertir de
xwedan parekê be.

Ev xebata li ser Rezanê ne tenê ji bo wê yekê hatiye kirin ku diroka herê mêmê tomar bike yan jî bîra wê ya hevpar biparêze, her wisa ji bo ku perspektîfeke cuda ji pêşkêş bike li ser senaryoyên mihtemel û ev jî dibe ku teşe bidin siberoja vê herê mêmê. Rezan ji berê de roleke navendî listiye di dînamîkên civakî, çandî û mekanî yên Amedê de û her dîsa, bûye cihêkî wisa ku dilê komên civakî yên li perên bajêr jî pê re lê daye. Ji ber vê, lêkolînên li ser dîrok, roja îroyin û siberoja herê mêmê krîtîk in, ne tenê ji bo baştir têgihîştina dîrokê, her wisa jî ji bo ku siberojê ev bibin alîkar di avakirina politîkayên dadwertir û berfirehtir de.

Di vê xebatê de levrasthatin û hevbirîna pêvajoyên koçberiya bi zorê, dînamîkên bajarbûnê û hevguhertina van, bi têgiha “bajarbûna bi zorê” tîr ravekirin. Ji ber pevcûn, valakirina gundan û politîkayên dewletê yên din kurd neçar mane ku jîngehên xwe li pey xwe bihêlin; bi vê koçberiya kurdan re, tevgerên niştecihên herê mêmê gundewar ber bi bajaran ve pir zêde bûne û deverine bajaran bi awayekî lezgîn û bêplan mezin bûne. Di vê pêvajoyê de mirovên ji gundên xwe bi zorê koçberkirî li hin cihên bajêr kom bûne, bînesazî û xizmetên bajaran ên heyî tîra vê zêdebûna ji nişka ve ya serjimara mirovan nekiriye û vê rewşê hejarî girantir û newekheviyên civakî û cihêbûna mekanî jî zêdetir eşkere kirine. Koçberiya bi zorê teşe daye tevna civakî û mekanî ya bajêr; ev têgih, ne tenê guhartîneke fizîkî ya mekanekê, lê di heman demê de veguherînên civakî, aborî û çandî yên vê demê jî di hewîne. Di vê çarçoveyê de bajarbûna bi zorê weke diyardeyeke mekanî, siyasî, civakî û aborî tî mîamelekirin û bandorên berfirehtir ên bajarbûna ji ber bêwarkirinê nîşan dide.

Dînamîkên bajarbûnê yên berfirehtir ên li Tirkiyeyê (wekî berbelavbûna koxikên bêdestûr, metakirina erdan û veguherandina bajarî ya bi kardariyê) û bajarbûna bi zorê ya li herêma kurdan, her çend ku di navbera van her duyan de hevparî hebin jî, ya duyem (wate, bajarbûna bi zorê ya li herêma kurdan) ji ber peywendî xwe ya dîrokî û erdnigariyî hin taybetmendiyên xweser raber dike. Bandora vê bajarbûna bi zorê ya li ser tevna bajarî ya Amedê ji ber pîvanga xwe (mezînahiya xwe) ew qasî diyar e ku bi navendên bajarên din re nikare were hevrûkirin. Di vê çarçoveyê de têgiha bajarbûna bi zorê di heman demê de îşaretê bi pêvajoyekê dike; bi vî awayî, pîrsgirêka kurd li asta bajarî careke din tî afirandin. Koçberiya bi zorê zemînek pêşkêş kiriye ku nasnameya kurd li bajêr ji nû ve teşe bigire û torên hevgirtin û berxwedanê bîr avakirin. Lê belê, di heman demê de aliyên hevpar ên vê pêvajoyê jî hene li gel hewildayîna dewletê

yên ku armanca wan kontrolkirina qadên bajarî û zêdekirina kontrola li ser pirsgrêka kurd e. Di vê çarçoveyê de, bajarbûna bi zorê hem weke stratejiyeke xweragirtinê hem jî weke meydana peyçûnê derdikeve pêşberî me. Ev têgih dihêle ku mirov mekane bajarî ne tenê weke jîngehekê, lê her wiha weke alaveke maddî û encameke şênber a têkiliyên desthilatê, polîtîkayên zorlêkirinê û pratîkên berxwedanê jî şîrove bike. Rezana bi dînamîkên koçberiya bi zorê û bi bêwarkirinê teşe girtî yek ji nimûneyên sereke yên bajarbûna bi zorê temsîl dike.

Ev xebat çîrokên takekesî yên niştecihên vê herêmê û çavkaniyên weşandî li cihekî kom dike û rola navendî ya Rezanê di peywenda Amed û tevgera kurd de tîne ber çavan. Her çend ku bergeha wê sînorkirî be jî, armanca vê xebatê ew e ku balê bikişîne ser kêmasiyên nihêrînên heyî û perspektîfeke alternatîf pêşkêş bike. Rezan çî bi tevna xwe ya mekanî, çî jî bi ya civakî be, pir-rengiyeke zêde di nav xwe de dihevine û bi têkiliyên xwe yên dîrokî û dînamîkên xwe yên roja îro tevna Amedê ya pir-tebeqeyî radixe ber çavan. Xebatên di vî warî de bi zêdetir kûrahî û berfirehî hatî kirin dikarin di wê yekê de bibin pişkdar ku herêm baştir bê famkirin û ji bo başkirina mercên jiyanî yên niştecihên Rezanê polîtîka bîna sazînin. Em hêvî dikin ku lêkolîna me eleqeya li ser dîrok û tevna civakî û çandî ya Rezanê zêdetir bike û bibe weşîle ku lêkolînên berfirehtir werin kirin.

Bîbliyografiya

Atlı, M. (2014). *Hepsi Diyarbakır*. İletişim Yayınları.

Bağlı, M., & Binici, A. (2005). *Kentleşme Tarihi ve Diyarbakır Kentsel Gelişimi*. Bilimadamı Yayınları.

Biçen, V. S. (2020). *1960'lerden Günümüze Çok Katlı Konut/Konutlaşma Süreci Diyarbakır Kenti*. Karadeniz Teknik Üniversitesi.

Bölge içi Zorunlu Göçten Kaynaklanan Toplumsal Sorunların Diyarbakır Kenti Ölçeğinde Araştırılması. (1998). Türk Mühendis ve Mimar Odaları Birliği Yayınları.

Dağlı, D., & Çağlıyan, A. (2021). Kentsel Gelişim ve Dönüşüm Sürecinin Belirlenmesi: Diyarbakır Örneği. *International Journal of Geography and Geography Education*, 43, 212-234.

Devlet İstatistik Enstitüsü. (1991). *1990 Genel Nüfus Sayımı: İdari Bölünüş (Özet Tablolar)*. DİE Yayınları.

Devlet İstatistik Enstitüsü. (2000). *2000 Genel Nüfus Sayımı: Nüfusun Sosyal ve Ekonomik Nitelikleri: Diyarbakır*. DİE Yayınları.

Displaced And Disregarded: Turkey's Failing Village Return Program. (2002). Human Rights Watch, 14(7).

Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Boşaltılan Yerleşim Birimleri Nedeniyle Göç Eden Yurttaşlarımızın Sorunlarının Araştırılarak Alınması Gereken Tedbirlerin Tespit Edilmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırması Komisyonu Raporu (10/25). (1998). TBMM.

Erman, T. (2017). Urbanization and Urbanism. Têde M. Heper & S. Sayarı

(Ed.), *The Routledge Handbook of Modern Turkey* (First issued in paperback, ss. 293-302). Routledge.

Gambetti, Z., & Jongerden, J. (Ed.). (2015). *The Kurdish Issue in Turkey: A Spatial Perspective*. Routledge, Taylor & Francis Group.

Güvenç, M. (2024). *The City is Ours: Spaces of Political Mobilization and Imaginaries of Nationhood in Turkey*. Cornell University Press.

Internal Displacement Global Overview of Trends and Developments in 2006. (2007). IDMC.

Işık, O., & Pınarcıoğlu, M. M. (2001). *Nöbetleşe Yoksulluk Sultanbeyli Örneği*. İletişim Yayınları.

Kaynaratepe'de kentsel dönüşüm adı altında göçertme planı - *Politika Haber*. (2021, Mayıs 1). <https://politikahaber.com/kaynaratepede-kentsel-donusum-adi-altinda-gocertme-plani/>

Keser, İ. (2011). *Göç ve Zor: Diyarbakır Örneğinde Göç ve Zorunlu Göç* (1. baskı). Ütopya Yayınları.

Özer, Ahmet. (2011). *Göç ve Kentleşme Kısacasında Bir Kent: Diyarbakır*. Têde N. Adabağ (Ed.), *Tüm yönleriyle Diyarbakır 2. Sempozyumu* (1. basım, ss. 271-288). DİTAV.

Öztürk, D. C. (2013). *Socio-Spatial Practices of the Pro-Kurdish Municipalities: The Case of Diyarbakır*. Orta Doğu Teknik Üniversitesi.

Tigris, A., & Çakar, Y. (2013). *Amed: Coğrafya, Tarih, Kültür*. Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları.

spasî

Lêkolîna di vê pirtûkçeyê de bi piştgirî û alîkariya **Navenda Hafizyê (Hafıza Merkezi)** pêk hat û em ji bo van piştgirî û alîkariyên wan ji dil spasiya wan dikin. Ji bo piştgirî û desteka wan a gelekî giranbiha, em bi taybetî ji **Mert Koçak, Noémi Lévy-Aksu û Umut Azak** re spasdar in.

Em xwe gelekî bişans dihesibînin ku li Amedê hem **Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê** hem jî **Şaredariya Rezanê** em bi dilgermî pêşwazî kirin. Her wiha, seba bi comerdî parvekirina zanînên xwe, civatên wan ên rohahebexş û piştgiriya wan a ji bo vê lêkolînê, em spasiya **Dilek Akyapı, Şerefhan Aydın, Ronay Bakan, Ferit Kahraman, Evin Mercan, Dilin Laçın, Arjin Taş û Çekdar Taşkiran** dikin.

Melek Yükselê di dema me ya li Amedê de ji destpêkê heta dawiyê bi mazûvaniyeke bêhempa em kirin mêhvan û piştgirî û cesaretdayîna xwe ya ji bo xebata me jî ji me tu carî kêmtir nekir. Em dixwazin bi taybetî destxweşî û malavayiyê lê bikin.

Herî dawî, em spasiyên xwe yê bêdawî li **niştecihên berê û îroyin ên Rezanê** dikin ku wexta xwe ji bo me veqetandin û tecrube û bîranînên xwe yê li ser jiyana li herêmê û veguherîna herêmê ya nav salan bi me re parve kirin. Em hêvîdar in ku di vê pirtûkçeyê de me karibe em çîrok û bîranên we bi layiqî nîşan bidin û girîngiya pêwîst bidin wan.

